



NAVENDA ÇANDA
MEZOPOTAMYA


REWŞEN

K O V A R A Ç A N D Ê

HEJMAR

1

BUHA 10 HEZAR
1. SIBAT 1992



NAVENDA ÇANDA MEZOPOTAMYA Û
REWŞEN LI GELÊ KURD PÎROZ BE!

REWŞEN

Navnîşan :

Tarlabası cad. No : 128
BEYOĞLU-İSTANBUL

Tel : 154 48 65

REWŞEN

Kovara Çandê

Mehê carekê tê weşandin.

XWEDÎ :

İBRAHİM GÜRBÜZ

SERKARA KARÊN NIVÎSÎ :

EDİBE ŞAHİN

BİRÊVEBİRÊ KARÊN WEŞANÎ :

HÜSEYİN KAYTAN

BERPIRSIYARÊ TÊKÎLÎYÊN
BI GEL RE :

İBRAHİM GENÇ

RÊZKIRINA NIVÎSAN :

REWŞEN

SAZÛMANA NIVÎSÎ :

HASAN BİLDİRİCİ

FEQÎ HUSEYN SAĞNIÇ

ALİ TEMEL

ABDURRAHMAN DÜRRE

HÜSEYİN KAYTAN

MEHMET GEMSİZ

İBRAHİM GENÇ

Baskı: Metinler Matbaacılık

XWENDEVANÊN HÊJA, BIBIN ABONEYÊN REWŞENÊ!

REWŞEN, NUH DEST BI JÎYANA XWE DIKE,

REWŞEN, KOVARA ÇANDÊ YE,

REWŞEN, JI NIVÎSÊN XWENDEVANAN RE VEKIRIYE,

REWŞENÊ, RÛPELÊN XWE JI BO REXNEYAN
Û BERHEVAVÊTINAN JÎ VEKIRINE,

REWŞEN, JI BO PARASTIN Û PÊŞVEBIRINA
NIRXEN KURDÎ XEBATÊ DIKE.

REWŞENê, BIXWÎNIN!..

REWŞENê, RE BINIVÎSÎNIN!

REWŞENê, BIŞOPIN!

REWŞENê, BIXWAZIN!..

REWŞENê, RE BIBIN ABONE.

REWŞENê, BIDIN XWENDIN.

REWŞENê, BELAV BIKIN.

REWŞENê, RE ABONA PEYDA BIKIN!

TÊKILÎ MALBATA REWŞENê BIBIN!

KARTA ABONETIYE

JÎ KEREMA XWE RE JI
HEJMARA PÊ VE,
MIN BIKIN ABONEYÊ KO-
VARA REWŞEN

NAV :

PAŞNAV :

NAVÎŞAN :

NAV WELÊT:

6 MEH : 60.000 TL

1 SAL : 120.000 TL

DERVA YI WELÊT:

6 MEH : 30 DM

1 SAL : 60 DM

HEKE

DAXWAZEK DIN

NE HATIBE

DAXUYANÎKIRIN,

MAFÊ RASTKIRIN,

KIN KIRIN,

WEŞANDIN

AN NE WEŞANDINA

NIVÎSAN

Ê SERNIVÎSARÎYA

KOVARA REWŞEN E.

BUHAYÊ REWŞENÊ:

10.000 TL

NAVEROK

Rûpel

Çima Rewşen?	4
Neden Rewşen?	6
Nasıl Bir Bilim, Sanat ve Kültür?	
REWŞEN	8
Parastina Zimanê Kurdî	
Hogir EHMED	9
Kürt Enstitüsü Kurulurken	
Seyda BERÇEMÎ	11
Mîr Bedîrxan Destûr Daye Zewicandina Kurd û Ermenîyan	
Faik BULUT	14
Röportaj : İsmail Beşikçi	
REWŞEN	18
Gelê Kurd û Wêjeya Kurdî	
Abdurrahman DÜRRE	21
Dersîm Ser Çend Qesey	
Berhem	25
Tartışma : Kürtçe Alfabe Nasıl Olmalıdır?	
İbrahim GENÇ	27
Qadî Muhammed	
Seyda BERÇEMÎ	29
Kürt Dili Üzerine	
Hüseyin KAYTAN	32
Niştimana Xwe Binase : Bêdlîs	
M. BOZAN	37
Din Dili Olarak Kürtçe	
Yaşar KAYA	40
Analiz : Kürtçede Kuzey - Güney Farklılaşması	
Hüseyin KAYTAN	42
Zîman, Çand û Gel	
Feqî Huseyn SAĞNIÇ	44
Pîşeya Gelê Kurd	
YETKÎN	45
Folklor	
İrfan ÖZTÜRK	46
Li Ser Pêşveçûna Wêneyên Kurdî	
Fevzi BİLGE	47
Memiyane	48
Röportaj : Koma MEZRA BOTAN	
REWŞEN	49
Dersên Zimanê Kurdî	
FARQÎNÎ	51

ÇIMA REWŞEN?

Xwendevanên Hêja,

Îro netewa me him di dema dîroka xwe ya diwartirîn û him jî di dema xwe ya bextewartirîn de dijî. Pêvajoyek diwar e, lewre hêzên mêtîngehkar bi çekên xwe yên hov li dijî gelê me yê ku ji bo mafstendina xwe ya netewî û demokratîkî dixebitîn radiwestin. Pêvajoyek bextewartirîn e, lewre ji sed hezar salan vir ve netewa me cara pêşîn e ku mîna kulmekê hatiye ba hev. Hewce nake ku em vê yekê bi curehekî wêjeyî bidin têgihandin. Gava gelê me di mîhrîcana (merasîm) law û keçên xwe yên şehîd de govendê digirin ji xwe vê yekê pir xweş nîşanî me dikin. Ev qonaxa bilindtirîna çanda Kurdî ye.

Çanda me Kurdan, bi rastî jî çanda berxwedaniyê ye. Ji serê dîrokê heyanî niha li hember kesên biyan yên talankar û hov têkoşîna xwe ya hebûnê û mafdar daye. Bi rewşa xwe ya îroyîn çanda me, dikare ji hemu gelên dinyayê re bibe minak û bi pêşveçûna xwe dikare demxa xwe li çanda hemdem bixe. Hê jî çanda me ber bi kemilandinê ve rê dikudîne. Îro hemî dilên gelên bindest û merivên bêçare yên ku tên pelixandin, li welatê me lê dixin. Dinya li me dinihêre û dipê.

Kovara me REWŞEN di demek weha de derdikeve. Armanca me ya yekemîn ev e ku em di waleya gelemperî de bibin neynika (eynika) çanda Kurdî. Ev pêyvir ne tenê ya Rewşenê

nê ye, ya hemû rewşenbîr û welatparêzên Kurdanê ye. Rewşen li ser bingeha daxwazên netewa Kurd ên ku bilind dibin, derdikeve. Ji ber vê yekê malê gelê Kurd e. Li pêşberî netewa xwe berpirsiyar e. Di riya ku diçe serfiraziyê de, piştvana gelê xwe ye.

Em girîngiya herî mezintirîn didin zimanê Kurdî. Dibe ku di hêjmarên me yên pêşîn de nivîsarên bi Tirkî hebin. Lê em hinekî neçar in. Di nava demê wê kovara we bi tenê bi zimanê Kurdî bê weşandin. Divê were zanîn ku zimanekî me yê dewlemend û bingeîn heye. Ya din jî bi têkoşîna rizgariya netewî re wê zimanê me jî rengê navnetewî bistîne, ku ji niha ve dest bi vê dest pê kiriye. Ji niha ve peyvên me yên weke "serhildan", "berxwedan", "serxwebûn" û "pêşmerge" derbasî lîteratûra navnetewî biye. Ji vê rewşê divê meriv gelek tiştan hîn bike.

Kovara me platforma gotubêj u gengîşîyan (mineqesayê) e. Em bawer in ku di vî de ew ê pir bi libat be. Lê belê gotubêj wê bi gotinan neyê kirin. Ewê bi berheman were kirin. Di zimanê Kurdî de gelek cihêtiyên girîng ên rastnivîsê hene. Divê ev cihêtiyên di demek kin de ji holê bêne rakirin û di ziman de yekîtiya netewî bê pêkanîn. Hewce ye ku di qadên navnetewî de jî em zimanê xwe bi sêweyekî ku bi netewa me û bi têkoşîna wî ya rizgarî bikeve, bînin holê û zimanê xwe bigihînin merheleyeke baştir.

Di vê babetê de azîna zanistî (metoda zanyarî) ew ê spartek û rênişana me be. Di vê hêjmarê kovara me ya yekemîn de wê hinek kêmasiyên me derkevin, çî jî hêla rêzenivîs û çî jî hêla rêzimanî (gramatikî) ve be. Ev yek jî, jî gotûbêjê re vekirîye. Ji bo ku em bigihêjin yekîtiyê, divê ramanên curbecur bêne bahev û li hev Kevin.

Em dixwazin eniyeke zanîst-çand û hunerê çêbikin. Netewa me jî aliyê çandî ve jî di bin zor, zehmetî û sitemê de ye. Her weha çanda me jî hatiye dagîrkirin.

Îro çekên dijminan ên zanîn û hûnerê, bawekati, belavî, xerakirinî (dejenere) û rizandin in. Ji bo ku li hevber wan têkoşîn bê kirin divêtî bi yekîtiya rêxistina welatparêz û rewşenbîran heye. Nekarî zanîne bi rêxistin û organîzekirî ne. Zanîn jî hewceyê rêxistinê ye. Dijminên hunerê jî rexistinkirî ne. Wê gavê divê huner jî xwe rêxistin bike. Divê ku çekên me jî li hemberê bawekatiyê, xwerûtî û ronakî, li hember belaviyan yekîti, li hember xerakirinan bi her curehiyê şoreşgêrî, li hember rizandinê jî cîwanî û zîndîtî be.

Pir tişt li ser ronekbîr û rewşenbîrên Kurdan hatine gotîn. Edî ew bi xerabî an qencî xwe dinasin.

Îro peywira rewşenbîrên Kurd pir giran e, lê bi qasî vê giraniyê jî xwedî xawen û rûmet e. Rewşenbîr li pêşberî gelê xwe berpirsiyar e. Îro gelê Kurd li pêşberî qirkirinan e. Lê dîsa jî dê û bav, zarok û cîwan ji bo ku xwe bigihînin azadiyê sîngên xwe jî gulên ra vegirtine û bi ser gulleyên dijminan de dimeşin. Divê rewşenbîrên Kurd van tiştan bînin ber çavên xwe û bi hêza xwe bi xwe van astengan ji holê rakin. Rewşenbîr divê bi taybetî jî dagerînên dîrokî û civakî yên van bîst salên dawiyê, bide ronîkirin, li ser wan lêgerîn û lêkolînan bike û binivîsîne û jî wan dersan derxe. Divê li ser dîroka me ya dîr lêgerîn bike, li ser pêşerojê bixebite.

Zanîn îro hin bêhtir ji bo me Kurdan pewîst e.

Huner û zanîn, ger bi rastî dixwazin bibin huner û zanîn divê ji xwe re deverê azad bînin. Divê qedexeya li ser huner û zanînê ji holê bê rakirin. Ew kesên ku ji bo diwariyan ji rêya xwe averêyî dibin nikarin bibin hunermend an jî zanyar.

Îro tu civak mîna civaka Kurd ku ji lêkolîn û lêgerîn re kêrhatiyê, amede ye tune. Welatparêz û ronakbîr divê vê yekê baş bidine nixandî (hêjandin). Bê rawestan divê ku dest bi xebatên rêzkarî, lêgerînî bikin û hilberînin.

Ew ê di **Rewşenê** de cîh bê dayin ji zanîn, huner, çand û her xebatan ji çî curehî dibe bila bibe.

Em gazî li her welatparêz û ronakbîrên Kurd dikin û dibêjin li dorhêla **Rewşenê** bîvin.

Em nivisa xwe bi helbesta helbestvanê mezin **Mayakovskî** yê ku beşdarî şoreşa cotmehê bûbû diqedînin:

Bimeşin

Bla dem li pey we biteqe

mîna mayînek!

Tiştê ku emê ji paşerojê re bihêlin

tenê bakirina gîzvanoka porê me, yê

li paş e...!"

Sernivîsariya Rewşenê

NEDEN REWŞEN?

Sevgili Okurlar,

Ulusumuz, bugün tarihinin hem en zorlu, hem de en mutlu dönemini yaşıyor. Zorlu bir süreçtir, çünkü sömürgeciler en vahşi silahlarıyla ulusal ve demokratik haklarını kazanmaya çalışan halkımızın karşısındadır. En mutlu süreçtir, çünkü binyıllardan bu yana, ulusumuz ilk kez tek bir yumruk olarak biraraya gelmiştir. Bunu edebi olarak anlatmaya gerek yok. Halkımız, evlatlarının cenaze törenlerinde halay çekerken, bunu anlatıyor. Bu, Kürt kültürünün doruğudur.

Biz Kürtlerin kültürü, gerçekte, bir direniş kültürüdür. Tarih boyunca hep yabancı, barbar güçlere karşı haklı bir varolma mücadelesi vermiştir. Bugünkü durumuyla kültürümüz, bütün dünya halklarına örnek olacak kadar gelişmekte ve çağına damga vuracak kadar olgunlaşmaktadır. Dünyanın mazlum insan ve halklarının kalbi bugün ülkemizde atıyor. Dünya bize bakıyor ve bekliyor.

İşte derginiz **Rewşen**, böyle bir dönemde çıkıyor. İlk amacımız, genel anlamda Kürt kültürünün aynası olmaktır. **Rewşen**'in bu görevi, bütün Kürt aydın ve yurtseverlerinin de görevidir. **Rewşen**, Kürt ulusunun yükselen taleplerinin bir sonucudur. Bu yüzden de, Kürt ulusunun malıdır. Geleceğe giden yolda, ulusuna destek olmakla yükümlüdür.

Kürt diline en büyük önemi veriyoruz. İlk sayılarımızda Türkçe metinler olabilir. Buna mecburuz. Ancak, zaman geçtikçe, derginiz salt Kürtçe olarak yayımlanacaktır. Bilinmelidir ki çok zengin ve köklü bir dilimiz vardır. Ayrıca, ulusal mücadelemiz ile birlikte, dilimiz de uluslararası bir nitelik kazanmaya daha şimdiden başlamıştır. "Serhıldan", "berxwedan", "serxwebûn", "pêşmerge" gibi sözcüklerimiz, daha şimdiden uluslararası literatüre geçmiştir. Bu durumdan çok şey öğrenmek gerekir.

Dergimiz aynı zamanda bir tartışma platformudur. Bu açıdan oldukça hareketli ve canlı olacaktır. Ancak tartışmalar, lafla değil, ürünlerle yapılacaktır. Yazım konusunda, Kürt dilinde önemli ayrılıklar var. Bu ayrılıkları ortadan kaldırıp, ulusal bir dil birliği yaratmak zorundayız. Uluslararası arenada da, dilimizi Kürt ulusuna ve onun mücadelesine yaraşır bir duruma getirmek zorundayız. Bu konuda bilimsel metod, dayanağımız ve yol göstericimiz olacaktır. Dergimizin bu ilk sayısında gerek yazım ve gerekse gramer açısından bazı eksikliklerimiz olacaktır.

Tartışmaya açıktır. Tartışma, bu davranışımızın dayanaklarını da ortaya çıkaracaktır. Yine dergimizde, aynı sayıda değişik imla anlayışlarıyla kaleme alınmış yazılara rastlayabilirsiniz. Birliğe ulaşmak için, değişik düşüncelerin bir araya gelmesi ve çatışması gereklidir.

Bir bilim-kültür-sanat cephesi oluşturmayı amaçlıyoruz. Bütün alanlarda olduğu gibi, ulusumuz, kültürel bakımdan da cendereye sokulmak isteniyor. Belirsizlik, bölünme, yozlaşma, çürütme, bilim ve sanat düşmanlarının bugünkü silahlarıdır. Bunlara karşı mücadele için, yurtseverler ve aydınlar birliği oluşturmak ve dayanışmak esastır. Bilim düşmanları örgütlüdür. Bilim de örgütlü olmak zorundadır. Sanat düşmanları örgütlüdür. Öyleyse sanat da örgütlü olmalıdır. Belirsizliğe karşı aydınlık ve netlik, bölünmelere karşı birlik, her türlü yozlaştırmaya karşı devrimcilik, çürütmeye karşı gençlik ve dirilik de bizim silahlarımızdır.

Kürt aydını üzerine çok şey söylendi. O artık iyisi-kötüsüyle kendisini tanıyor. Kürt aydınının bugünkü görevleri çok ağırdır, ama ağırlığı ölçüsünde de onur vericidir. Aydın, halkına karşı sorumludur. Bugün Kürt halkı katliamlarla karşı karşıyadır. Ama yine de analar, çocuklar, babalar ve gençler, özgürlüğe giden yolu açmak için kurşunların üstüne yürümektedir. Kürt aydını bunları gözönüne alarak, önündeki engelleri kendi öz gücüne dayanarak kaldırmak zorundadır. Özellikle son yirmi yılın tarihi, toplumsal dönüşümleri araştırılmalı, yazılmalı ve bunlardan dersler çıkarılmalıdır. Uzak tarih araştırılmalıdır. Gelecek araştırılmalıdır.

Bilim, bugün en çok biz Kürtler için gerekiyor.

Sanat ve bilim, gerçekten sanat ve bilim olmak istiyorsa, kendine özgür bir ortam yaratmalıdır. Yasaklar, sanat ve bilim için engel olmaktan çıkarılmalıdır. Zorluklar var diye yo-

lundan sapan insan, sanatçı ya da bilim adamı olamaz.

Bugünkü Kürt toplumu kadar bilim ve sanat çalışmalarına elverişli başka hiç bir toplum yoktur. Yurtseverler ve aydınlar bunu iyi değerlendirmelidir. Hiç durmadan disiplinli çalışmalara, araştırmalara başlamak ve üretmek gerekiyor.

Rewşen'de, bilim, sanat ve kültürün her alanında, her türden çalışmalara yer verilecektir. Bütün aydın ve yurtseverleri, **Rewşen** çevresinde birleşmeye, **Rewşen**'i desteklemeye ve çalışmalarını bu çerçevede sürdürmeye çağırıyoruz.

Sözü, Ekim devrimine katılan büyük şair **Mayakovski**'nin mısralarıyla bitiriyoruz:

"Yürüyün

zaman patlasın ardınızda

bir mayın gibi!

Bizim geçmişe bırakacağımız,

yalnızca bukeleri

rüzgarda geriye savrulan saçlarımızın...!"

Rewşen Yazı Kurulu

NASIL BİR BİLİM, SANAT VE KÜLTÜR?

Herhangi bir toplumsal olay ya da olgu incelenirken, gerçekleştiği tarihi süreç içinde ele alınmalı, kendisini gerçek kılan etkenlerin birbiriyle ilişkileri ve çelişkileri iyice irdelenmelidir. Toplumsal olaylar tarih içerisinde süreçlenir. Bu yüzden zaman boyutu bu olayları inceleyenler için bir yandan büyük bir önem taşıırken, öte yandan göreceli/relativ oluşun özellikle baskın oluşu nedeniyle, ince eleyen sık dokuyan bir bilimsel dikkat gerektirir. Araştırmacı; incelerken, gözlerken bir bireşime varan ve **değiştirir**. Çünkü tarihi yaratan ve yaşayan doğaüstü boş güçler değil; doğanın, dolayısıyla insanın kendisidir. Bu açıdan bilim adamı, burjuva doktorinlerinin ikiye bölünmüşlüğüyle ileri sürdükleri gibi tarafsız değil, taraflıdır. Gerçek bilim adamı, nesnellikten ödün vermeyendir, **kişisel** çıkarları ya da korkuları karşısında **kişisizliği** seçmeyendir. Biz Kürtlerin bu bilim adamına ihtiyacı vardır.

Bir parantez açıyoruz:

İnceleme ve araştırmaların sağlıklı sonuç verebilmeleri için gerekli yöntem, kuşkusuz bilimsel yöntemdir. Ancak, bilimsel yöntemin en önemli tekniklerinden olan sınam tekniği, tarihi süreç içerisinde oluşmakta olan toplumsal olaylarda uygulanamıyor. Bunun yerine, toplumsal araştırmalar yapan bilim adamının, araştırmaya konu olan toplumda, elde ettiği veriler ve vardığı sonuçlar doğrultusunda, toplumsal gelişime ve dönüşüme doğrudan **katılması** gerekiyor. Bu aynı zamanda onun nesnellüğünün, dolayısıyla doğruluğunun ölçüsüdür.

Sömürgeciler öteden beri Kürt ulusunu, üzerinde yaşadığı topraklarda yaratmış olduğu tarihi ve kültürel tüm değerlerden arındırmak için bü-

yük çaba sarfettiler. Bugün de bu çabaları bütün yoğunluğu ile sürmektedir. Katliamlar, sindirmeler eşliğinde uygulamaya koydukları asimilasyon politikası, bütün etkileriyle gündemdedir. Bir yandan kültürel kimliği tanıma gibi, ulusal mücadele karşısında zorunlu olarak verilen demokratik bir haktan söz edilirken, öte yandan **GAP yayını** gibi araçlarla Kürt halkına tepeden inme bir Türk kültürü vermeye, Kürt kültürünün üstünü örtmeye yönelik çabalar da uygulamadan kaldırılmıyor. Bütün bu çabaların amacı, tümüyle edilgen, kanının emilmesine ses çıkarmayan, köle bir toplum ve kimliksiz ve kişisiz bir insan (!) tipi yaratmaktır. Ulus bilincine erişmiş, kişilikli, üretken bir Kürt toplumunu sömürmek hiç de kolay olmayacaktır; sömürgeciler bunun farkındadır. Bugün ağzlarında adeta gevelenen 'anadil serbestliği', 'kendi kültürünü geliştirme' gibi 'bahşetmeler', Kürt ulusal ve demokratik mücadelesinin kopardığı tavizleri açıklamaktan çok, sömürgecilerin neredyse gelenekselleşmiş ikiye bölünmüşlüğü göstermektedir. En azından bugün, bu demokratik 'lütuflar', sömürgecilerin ulusal uyanışımıza karşı son güçlerini sarfederken katliam* silahının kılıfı olarak ortaya konmuştur. İşte tam da bu yüzden, Kürt bilim adamının, Kürt sanatçısının ağırlık vermesi gereken nokta, **ulusunun yararına dönüştürücü işlevler üstlenmesi**, ulusal ve demokratik mücadelede herkesten daha etkin varolması, bu konularda gerçek bilim adamı ve sanat adamı onuruna yaraşır biçimde ödünsüz olmasıdır.

Uygarlığı kurup dünyaya yayan bir kavim, Indo-Germen kültür ırmağının kaynaklığını yapan bir kavim, bugün, süregelen askeri ve beyaz katliamların bir sonucu olarak, kültürel

açıdan dünyada eşine az rastlanan olumsuz bir konumdadır. Kürt ulusunun köklü değerleri, sömürgecilerce sistematik bir biçimde tahrip ve tahrif edilmiş, bilim adamı onurları Dr. Mengele'den kat kat üstün profesörlerce Kürt ulusal değerlerinin içi boşaltılarak kendilerine maledilmeye çalışılmıştır. Ülkemizdeki arkeolojik buluntular yağmalanmış, yok edilmiş, çarpıtılmış ya da gizli arşivlere kaldırılmıştır. Bilim adamlarımızın sorumluluğu büyük ölçüde bu süreci tersine çevirmektir. Bu potansiyeli bugün verilen mücadeleler sayesinde taşıyoruz. Ulusumuzda bugüne dek yüzyıllardır görülmemiş büyüklükte bir coşku var. Ancak bu coşkuyu, onu doğuran kaynaktan ayırmanın, bir haftalık cenin ile anası arasındaki göbek bağına kesmek anlamına geleceğinin, ve böyle bir ayırmanın her iki örnekte de aynı sonucu, ölüm sonucunu vereceğinin bilincinde olmalıyız.

Bir ulus için en büyük felaket, 'tarihinin düşmanları tarafından yazılmasıdır. Bu felakete uğramış bir ulus olarak biz Kürtler, tarihimizi yeniden ve kendi ellerimizle yazmak gibi **doğal** bir görev ile karşı karşıyayız. Sınırlı sayıda kalmış olsa da, tarih, kültür ve edebiyatımıza ilişkin ne kadar eser varsa bunları arayıp bulmak ve özenle bilimsel bir incelemeden geçirerek ulusumuzun hizmetine sunmak zorundayız.

Kürtler, bilim-sanat-kültür çalışmalarını bugün, bütün bu tarihi konumu gözönüne alarak, birer Kürt olarak sürdürmek zorundadırlar. Kişilik olmadan sağlıklı toplum olmayacağı gibi, ulusal değerleri taşımadan da enternasyonalist olunamaz.

Rewşen

* Bu yazı Lice-Kulp katliamları öncesinde kaleme alınmıştı.

PARASTINA ZIMANE KURDÎ JÎ BIREKE GIRÎNG JI PARASTINA NETEWA KURD E

Hogir EHMED

Zimanê Kûrdî, hebûna netewa Kurd, ta îro parastî ye. Weke ku têtê zanîn, netewe bi gelek cûreyan têne parastin. Di dîroka gelê me de, gelek serîhildan û berxwedan afirîne. Gelê me, tu caran stûyê xwe li ber dijminan xwar nekiriye. Her tiştên dijmin heya bi ol (din) jî, bi dil ne pejirandiye (Qeubul nekiriye) li dijî dagirker û împaratoran derketine çiyay, bi kevir û kevkanîkan (kevirkanî) xwe parastiye û biryar û fermanên dijminan hilnegirtiye. Huner û xweparastina gelê me jî, ji wir têt.

Gelê me dem bi dem, bi berxwedanên bêhempa jiyana xwe domandiye. Di gel wê jî bi giranî zimanê xwe yê zikmakî heya iro parastiye. Parastina zimanê me, ji bo hebûna gelê me pîrozbahîyeke mezin e. Zimanê me, bûye bingeha hebûna netewa me.

Bi rastî, dijminên netewa Kurd, di gelek waran de gihane pêkhanîna armancên xwe. Weke talankirina binax û serax, perçekirin, cudakirin, koçberkirin û komqirkirina girsên gelê Kurd. Gelê me, ta roja iro hebûna xwe bi zimanê xwe parastiye. Ji bona vê yekê mirov dikare bibêje zimanê Kurdî ji bo netewa Kurd bûye çek, şewq û ronahî. Weke her zimanî, zimanê Kurdî jî pêwîstî pêşveçûn û vekolînê ye. Bi ziman heqî û neheqî ji hev têne der. Ziman, evîn û aramê, hesret û hêviyê, zanîn û nezannînê, başî û nebaşîye ji hev dertîne. Bingeha jiyana û nîşana mirovan, ziman e. Kesên ku li dijî zimanê netewa Kurd derdikevin, ew ji taybetiyên mirovahiyê dûr in. Dijderketina zimanê Kûrdî, ne tenê qedexekirina wî ye. Lê belê, yê ku xwedî li zimanê xwe dernekeve, ew jî bixwazin nexwazin dibin alîkarên wan kes û rejîman. Tu caran parastin û pêşvebirina zimanê me ne bi destê kes û hêzên biyanî ye. Ew nikarin vê xebatê ji me

re bikin. Her nijadek, dikare zimanê xwe biparêze û derd û êşên arama dilê xwe, lorik û stranên xwe bîne ziman. Kesên kû bixwazin ji bo hişyarbûn û zanabûna gelê xwe bixebitin, bixwazin xizmeta gelê bikin, pêwîst e zimanê wî gelî fêhm bikin. Ger ji gel fêhm nekin, nikarin derd û êşa wî gelî jî fêhm bikin. Heke ziman tunebe mirov nikare şêrîn û tehlîyê, şorî û tirsîyê, tahmî û bêtahmîyê (biçêjbûn û bêçêjbûnê) ji hev derîne. Ji hevderanîna van jî bi Kurdî qedexeyê ye. Dijminên Kurda vê qedexeyê kirine. Zagon bi dermafê wê derxistine. Di, cihanê de qedexebûna ziman nehatiye bihîstin û ne jî dîtîn. Tenê ev li Kurdistanê pêk hatiye. Çawa ku têtê gotin "Însan ji axaftinê ji hev fam dike û heywan ji bêhnê..." Hovîtiya dagirkerên li Kurdistanê, di vir de baş têtê fêmkirin.

Li gor zagon û fermanên neyaran, gava mirovê Kurd, bi zimanê xwe, armanc û hêviyên di dil de, yan jî gili û gazincên xwe yên di dil de, bîne ziman, dibe gunchkar!? Mîna ku mirovek kuştibe.

Li gor kedxwar û baweriyên rewşenbîrên wan, kesên kû bi Kurdî deng dikin û dinivîsin, hemû gunchkar in. Ger bi zimanê Tirkî yan zimanekî din nizanibin jî, dîsan giring û pêwîst e bi zimanê Kurdî nehaxivin. Ji nivîskarên wan bigire û heya komunistên wan, Kurd weha mîna "heywanan" dibînin. Mixabin! Neyarên gelê me her tim bi vî çavî li me nêrîne jî. Di dîroka mirovahiyê de, pirî gelan zilm û zordarî dîtine. Lê tu gelî mîna gelê Kurd, bi vî awayî qedexekirin nedîtiye. Di van çend mehên dawiyê de, hilanîna zagona(kanûn) qedexekirina zimanê Kurdî, karekî gelekî demokratîkî dibînin. Zimanê Kurdî bûye destika propagandaya wan. Dibêjin; "lorik, stran, dilok, helbest û hwd... êdî ne qedexene. Lê! Ax û wa-

xa ji destê zilmê! Nivîsîn, çapemenî û weşandina bi Kurdî qedexene!" Ev serbestkirina beşekî şerê taybetî ye. Dîsan jî pêwîst e, tu bi destûra dewleta Tirk deng bikî û bi axîfî. Nabe ku tu ji bo pêkhanîna armancên gelê xwe, xwe û pêşxistina zimanê xwe binivîsî, bixwînî û bihizirî. Zincîr li gelê xwe û pêşxistina zimanê xwe binivîsî, bixwînî û binêrî. Zincîr li zimanê me gerandine û kilît kirine.

Xwendevanên hêja, mebesta min ji vê nivîsarê ne tenê dijîtiya kedxwaran e, ku bi her awayî li dijî zimanê me disekin û dixwazin wî tune bikin. Lê mixabin, mirovê me vê yekê tenê di teoriya xwe de dizane. Di karwaniyê de pêknahe. Mebesta(meqseda) min ew e ku hinek rexneyên dostaniyê li wan bikim. Ez dikarim bibêjim, ev rexneyên min piranî li rewşenbîrên Kurd in!? Ev rexneyên min ên dostaniyê li dilsoz, şoreşger, nivîsevan û ramyarvanên Kurdistanê ne. Gumana min ji welatparêzî û dilsoziya wan tune ye.

Dibêjin em welatparêz in, şoreşger û nivîskar in, di axaftina xwe ya rojênin de, di civîn û bangeşîya (propaganda) xwe de bi wêjeya Tirkî, Erebî û Farisî deng dikin. Bi wan zimanan mijûl dibin, bi wan zimanan doza zimanê Kurdî dikin. Dibêjin, axaftina bi zimanê Kurdî ne giring e û dijar(zehmet) e. Ez dibêjim; dijmin, negiringiya zimanê Kurdî (!) xistiye mejiyê me. Dîtina zehmetiya wê jî, xizmeta netewa me nake.

Gelo, axaftina bi zimanê Kurdî, ji têkoşîna çekdarî, ji îşkence û sitemkakariya rîya dijmin zor û diwartir e?! Na, kes nikare bêje diwartir e. Gelek nivîskar û hozanvanên Kurd, nikarên rewşa Kurdistanê di nivîsin û axaftina bi Kurdî de bînin ziman. Ger bînine ziman jî, bêtehm dikin û diherimînin. Nikarin li ser hev û din,

çar gotinan rêz bikin. Di mêjiyê xwe de, bi Tirkî, Erebi û Farisî difikirin û paşê dixwazin bi Kurdî bînine ziman! Bi wan zimanan derînin, bi Kurdî bibêjin! Bi wan zimanan gotinan çêdikin bi Kurdî distrên! Bi wan zimanan zimanê Kurdî diparêzin! Ji lew re tu xweşiyê di vî zimanî de nahêlin. Bi ser vê yekê de jî, dibêjin "zimanê Kurdî gelekî paş de maye. Ne zimanekî nûjen e. Ne yê politikaye ye. Mirov nikare bi Kurdî tiştekî bîne ziman..." (!)

Bi rastî eger mirovê Kurd nikari be tiştê di dilê xwe de bi Kurdî bîne ziman, wê demê nikare derd, êş û kedêrên gelê xwe jî bîne ziman. Heke em ji bo gelê xwe bihizirin, binivîsin û têbikoşin, berî her tiştî, pêwîst e em zimanê xwe ji bo pêşveçûna xebatê bingeş bibînin. Pêwîst e em bi zimanê xwe bistirin, binivîsin, di nava malê de pê deng bikin... Û di jiyane de bi kar bînin.

Bi giranî girsên gelê me, zarokên xwe hînî Tirkî, Erebi û Farisî dikin, ji zarokên xwe re bi Tirkî, Erebi û Farisî deng dikin. Dibêjin em pir li paş in, divêt zarokên me hînî Tirkî bibin, da ku mîna me li paş nemînin. Bikaribin li her cih û derê deng bikin, erk û wezîfeyan hilgirin. Bibine mamoste, bibine mamûr, bibine doktor û hwd... Hêvî û pêşketinê, di zimanê Tirkî, Erebi û Farisî de dibînin. Zanistiyê di axaftina zimanên Tirkî, Erebi û Farisî de dibînin. Ew bi xwe di mêjiyê xwe de zimanê Kurdî zimanekî fermî (resmî) nabînin. Mîna karbîdestên Tirkî/Erebi/Farsî, zimanê serdestan, zimanekî fermî dibînin. Dibêjin, dema ku Kurdistan serbixwe bibe, em ê hingê bi Kurdî deng bikin, Kurdî bixwînin û binivîsin. Anku Kurdî niha girîng nine û tu berjewendiyê ji kesbûna me re peyda nake. Şoreşgerên me jî dibêjin, em doza rizgariya çînî û netewî dikin, doza zimên nakin. Rizgarî û pêşketina zimanê Kurdî, bi rizgariya Kurdistanê ve girêdayî ye. Rast e, lê pêşketina zimên jî, mîna hestî û goşt bi rizgarkirina welêt ve girêdayî ye. Cûda-

kirina wan ji hev ziyaneke digehîne zargotin, çand, wêje û pêşveçûna civaka me. Mîna hozanekî bê tembûr...

Sosyalîstên me Kurdan jî dibêjin: "Em înternasyonalîst in. Em tu cûda-bûnê naxînin navbera zimanan. Mirov bi çî zimanî jî hev fêm dike, pêwîst e bi hev re bi wî zimani deng bike. Deng kirina bi Kurdî pir negirîng e. Ew kesên kû bi giranî li ser zimên disekin ew mijadperest in..." (!) Ev nêrîna bi bîr û baweriya min, nêrîneke pir çewt e. Ne înternasyonalîstî ye û ne jî şoreşgerî ye. Her welatparêz û demokratekî Kurd pêwîst e, bi têkoşîna netewa Kurd re, zimanê Kurdî jî bi pêşveçûnê û xwedî lê derkeve. Bêyî pêşxistina zimên, têkoşîna şoreşgerî nabe. Bêyî têkoşîna şoreşgerî jî ziman bi pêş nakeve. Her dû bihev ve girêdayî ne. Pêwîst e em tenê bi yekê negrin û yên dinê jî bernedin.

Sazî û kesên ku li dijî pêşxistin û axaftina zimanê Kurdî ne, ew li dijî netewa Kurd in. Kesên ku Kurdî girîng nabînin, ew folklor û mafê gelê Kurd ê jiyane jî girîng nabînin. Kesên ku ji bo pêşxistina zimanê Kurdî vekolînan çêdikin, lê Kurdî di jiyana xwe ya rojenîn de bi kar nayê jî bi kar nahênin, ew nikarin jî gelê Kurd fêm bikin. Ji bo nimûne ji gelek Kurdnasên ku xwestine jiyana gelê Kurd bizanibin, berî her tiştî Kurdî hîn bûne. Di dîrokê de gelek kesên weha hene.

Kesên ku zimanên Tirkî, Erebi û Farisî jî zimanê Kurdî girîngtir û pêşemintir dibînin, ew baweriya serdestên Tirk, Erebi û Farisan tînine ziman, ne baweriya Kurdî.

Mamostayê me, civaknas Dr. Îsmail BEŞİKÇİ, di rojnameya SERXWEBÛNê, (hejmara 111, rûpel 30) de dibêje: "Di navbera baweriyê û zimên de baweriyeke gelek girîng heye. Ger hûn bi Kurdî deng bikin, hûn mîna Kurdan jî dihizirin. Eger hûn bi Tirkî deng bikin hûn mîna Tirkan dihizirin. Ji bona

Kurdan mijûlbûna bi Kurdî ji ya Tirkî girîngtir e. Ger nîrx û qiyemê nedin Kurdî, têtê xuyakirin ku mêjiyê Kurdan têtê dagîrkirin. Her weha jî xuya ye, ku di civatekê de dagîrkeriya herî hov ji ya mêjî destpêdike. Ji bo kedxwariya mêjî yê Kurdan sazûmanên kedxwaran her tişt kirine."

Li Kurdistanê civaka Kurd tar û mar bûye. Di her hêlê de bandoriya dijminan li gelê me bûye. Her demê, dijminan xwestine mirovên me sist û pûç bikin. Li gora vê jî, biryar û fermanên xwe deranîne. Bi sedan sal in, dijmin dixwazin bi zor û pîlanên xwe, me ji holê hilînin.

Bi rastî eger em îro bi zarokên xwe re bi Kurdî deng nekin, Kurdî zimanekî resmî yê xwe nebînin û mîna dijmin li zimanê xwe binêrin, bêguman ev xizmeta siyaseta dijmin dike. Ev bi xwe jî ramana Tirk, Erebi û Farisan e. Em bixwazin ne xwazin dibîne maşe û haceta dijmin li dijî zimanê xwe. Kesên ku demokrat û şoreşger in, ku dibêjin axaftina Kurdî ne girîng e, ew jî ji hêlekê ve para xwe di vê kêmasiyê de distînin.

Pêwîst e ku em baş bizanibin Kurdayetî, welatparêzî, demokratî û sosyalistîya me, bi xwedîderketina li doza Kurdistan û rizgariya netewa Kurdistan e. Barê me ev e, raman û baweriya min jî ev e.

Ez dibêjim, eger em bi leşgerî, aborî, ramyarî û çandî li dijî dijmin bisekinin, pêwîst e em zimanê xwe jî biparêzin û ji wê xebatê veneqetînin. Jê cûda nekin, pê ve girêdin, di jiyana xwe ya rojê de bi kar bînin. Pêwîst e em zarokên xwe mîna Kurdan mezin bikin, ne mîna Tirk û Erebi û Farisan.

Divêt em mîna xwîna jiyane, ya di reh û damarên xwe de, zimanê xwe jî di jiyane de bi kar bînin û bîdin pêş. Bingeha jiyana netewî bibînin. Li hevberî politikaya dijmin wî weke namûs û rûmeta xwe biparêzin.

KÜRT ENSTİTÜSÜ KURULURKEN

Seyda BERÇEMİ

Geleceğin toplumu, ancak içinden geçtiği sürecin bilim yöntemiyle incelenmesinden sonra, ortaya çıkan sonuçlar temel alınarak oluşturulur. Kürt halkı yüzyıllardır yaşadığı sömürge süreci sonucunda, gerek maddi gerekse manevi güçlerinin özgür gelişim dinamiklerinden yoksun olarak yaşadı. Bu sürecin sonuçlarını bugün görmek mümkün. Ancak bu sürecin ve Kürt halkının geleceğinin aydınlatıldığını görmek mümkün değil. Kürt halkının iradesi dışında bölünüp parçalanarak ulusal maneviyatının ve kişiliğinin, kültürel değerlerinin tahrip edilmesinin, özgür isteklerinin kanla boğulmasının yarattığı sonuçlardan bir an önce kurtulması gerekiyor. Bu sorunun aşılabileceği konusunda bugün her zamankinden daha inançlıyız.

Bedeli çok ağır da olsa, Kürt halkı bağrından çıkardığı evlatlarının, o hiçbir değer ölçüsüyle açıklanamayacak derecedeki özverisiyle, geleceğin Kürt toplumunun önündeki sis perdesini araladı. Bu mücadelenin yarattığı dinamiklerin çok yönlülüğü ve ulusal bilinçlenme sürecinin büyük bir ivme kazanmasıyla, önündeki problemlerin çözümü için gerekli adımların sağlam bir şekilde atılması gerektiğini kavrayabilecek duruma geldi.

Bu kavrayış, bugün vardığımız aşamada kurumlaşmış yapılara duyulan ihtiyacın kendisini hissettirmesinin bir sonucu olarak, Kürt Enstitüsünün oluşturulması aşamasına vardı. Yukarı Mezopotamya Kültür Merkezi'nin yoğun çabaları sonucunda oluşturulan girişim komisyonu da bu konuda gerekli adımları atmak üzere çalışmaya başladı. Böylesi bir yapılanmanın zorunluluğunun kavranması, oluşumu, gerekli maddi ve manevi koşulların hazırlanması için hiç

de az bir bedel ödenmedi. Özellikle 80'li yıllardan sonra gelişen mücadelenin Kürt halkı için yarattığı sonuçların, konumuzla ilgili olarak yeniden vurgulanması gerekir. Bu mücadele bir taraftan Kürt halkının içine düşürüldüğü sosyal aşağılık psikolojisinin kurtulması için gerekli objektif koşulları dayatırken, bir taraftan da egemen ve sömürgeci zihniyetin kendisini kabul ettirmek ve bunun devamlılığını sağlamak için oluşturduğu düşünsel-ideolojik yapının parçalanmasına neden oldu. Kürt halkının, meşru ulusal haklarının kabul edilmesi için, kendisinden önceki bütün mücadele biçim ve yöntemlerini eleştirel süzgeçten geçirerek, tarihsel olarak hakettiği yere ulaşma doğrultusundaki yönteminin bir sonucu vardır karşımızda. Bu sonucun, yine ulusumuzun ihtiyaçlarını kavrayıp karşılayacak bir şekilde değerlendirilmesi gerekir.

Büyük bir kuşatma ve saldırı altında olan ulusal değerlerimizin gün ışığına çıkartılması, var olanların korunup geliştirilmesi ve ulusumuzun hizmetine sunulması, yadsınmaz bir gereklilik olarak karşımızda durmaktadır. Bu da ulusal örgütlenmemizin bütün yönleriyle gerçekleşmesi ve bunlar arasında organik bir bağın kurulmasıyla olanaklıdır. Ulusumuzu sömürgeleştiren güçlerin çok yönlü saldırısı, yine ancak bütün bu saldırılara cevap verebilecek bir çok yönlülükle gerçekleşebilir. Kürt toplumunun uluslaşma sürecini etkileyen faktörlerin tanınması gerekiyor. Bu konuda, yaşadığımız sömürgeleştirilme sürecinin ülkemizde yarattığı ekonomik geri bırakılmışlığa paralel olarak sosyal, kültürel ve siyasi geriliğin aşılması da, büyük bir problem olarak karşımızda durmaktadır. Oluşturulması düşünülen Kürt Enstitüsü'ne

bu perspektifle yaklaşmak gerekmektedir. Nitekim, Enstitü için oluşturulan girişim komisyonundaki konuşmacılar da kendi çalışma alanlarına uygun olarak bu gerçeği dile getirmişlerdir. Örneğin : Y.M.K.M. yöneticisi **İbrahim GÜRBÜZ** yaptığı konuşmada, *"İç ve dış koşulların dayatması sonucu oluşan mevcut ortamda, devletin en yetkili organlarında enstitü olgusunun tartışılma-ya başlanması karşısında, M.K.M.'nin pratik adım atmada daha fazla beklemesi yanlış olurdu. Kürt Enstitüsü'nün kurulması için en üst seviyede bilim, sanat ve kültür adamlarımızın bir araya getirilmesi, onlarla bu sorunun konuşulması ve tartışılıp sonuca varılması gerekiyordu. Yani bu konuda Kürt halkının özgürleşmesinden yana bilim, sanat ve kültür adamlarının düşüncelerinin alınması ve bu doğrultuda pratik kararlara varılması bir zorunluluktur. Hatta bu konuda geç bile kalınmıştır,"* diyerek konunun oluşumu, zamanlaması ve tekniği açısından önemli vurgular yapmaktadır. Gerçekten de, özellikle yakın tarihteki mücadele sürecinin bizlere gösterdiği bir gerçek vardır. O da şudur: Sömürgeciler hiçbir zaman, egemenlik altına aldıkları ulusun hiçbir alanda kurumlaşmasını istemezler. Bir oluşum söz konusu olsa bile, bir bağımlılık zinciri yaratarak, yine ancak kendi denetimleri altında kurumlaşmaya göz yumabilirler. Bu yüzden kurulması düşünülen enstitünün bu tür bağımlılık ilişkilerinden kendisini tamamen soyutlaması ve yaratacağı şeyleri kendi öz gücüyle yaratması gerekir.

Sosyolog **Dr. İsmail BEŞİKÇİ** de yaptığı konuşmada 1960'lı yıllar-

dan sonra Kürtler üzerine başlayan araştırmaların daha sonra nasıl engellendiğini ve Kürt orijinli değerlere karşı nasıl bir asimilasyon politikası izlendiğini anlatıyor ve bu engellemelere karşı savaşta izlenmesi gereken yöntem ve bilim ahlakı konusundaki düşüncelerini çarpıcı bir örnekle somutluyordu.

"Kürtler ve Kürdistan'a ilişkin incelemeler yapanlar da, bu incelemelerin önündeki engelleri ortadan kaldırmak durumundadırlar. Yasaklarla mücadele etmek ve yasakları etkisiz kılmak görevleri vardır. "Burada yasak var, yasak olmayan başka bir alan üzerinde çalışalım", demek, bilim ahlakına aykırı bir tavır ve davranıştır. Düşünceyi yasaklayan, düşünceyi engelleyen bu tavır ve davranışla mücadele etmeden bilimi ilerletmek, demokrazi ve insan haklarını geliştirmek mümkün değildir", diyerek mücadelenin gerekliliğini vurgulayan Beşikçi; "Araştırmacılar, Kürt yayın organları, başta Devrimci Doğru Kültür Ocakları olmak üzere bazı örgütler, Kürt siyasal akımları, yasaklayıcı bu düşünceye, bu tavır ve davranışa karşı önemli mücadeleler yaptılar. Bu süreçte önemli bedeller ödendi. 1980'li yıllardan önce de bu konuda önemli birikimler oluştu. Bu birikimler 15 Ağustos 1984'ten sonra da PKK'nin düşüncesi ve eylemi ile bütünleşti. Yasaklara ve engellemelere karşın çok yoğun bir bilinç oluştu. Şimdi hukuken bu engellemeler, bu yasaklamalar yine var. Fakat fiilen bu yasaklamalar ve engellemeler gittikçe aşınıyor. Fazla bir etkinliği kalmadı. İnsanlar beyinlerindeki karakolları yıktılar, özgürleştirdiler."

"İşte Kürt Enstitüsü gibi kurumlara bu noktada ihtiyaç var. Artık

yasaklar geriletilmiş, aşılmış... Kürt gerçekliği bütün açıklığı ile ortada duruyor. Kürt dili, Kürt edebiyatı, Kürt kültürü üzerine yoğun ve kapsamlı araştırmalar gerekiyor. Kürt folkloru, Kürt el sanatları, vs. elbette incelenmelidir. Kürt toplumunun bugünü, Kürt toplumunun tarihsel evrimi, en ince ayrıntılarına kadar incelenmelidir. Bunların gerçekleştirilebileceği alan Kürt Enstitüsüdür," diyerek, enstitünün yapması gerekenleri ve bu sürece nasıl geldiğini anlatıyordu.

Konuşmacılardan ekonomist Yaşar KAYA ise, Irak ve Suriye'de yaşayan Kürt halkının, Türkiye sınırları içinde yaşayan Kürtlere göre, kültürlerini geliştirme ve koruma anlamında, sahip oldukları nispi avantajları vurguluyor ve Kürt Kültürünün bugün gerek Kürdistan'da, gerekse Kürdistan dışında bir "rönesans" yaşadığını ifade ediyordu.

"Bir çok Kürdün kafasındaki tarih bilinci kazanmış, yok edilmiş; dil, edebiyat, yazılı eser, basın, demografi, sosyoloji, felsefe yine öyle... Peki bunlar nasıl inşa edilecek? Tabii ki kültür kurumları ile. Kürt Enstitüsü bir akademi olmalı. Geçmişte Kürt diline, edebiyatına, gazeteciliğine, tarihine, resim ve el sanatlarına emek vermiş, yaratıcı olmuş herkesi araştırmalı, Kürt kültürü hazinelerini bünyesindeki akademisyenler kurulundan geçirerek yayınlamalı, Kürt fikir ve düşünce sistemlerini olgunlaştırmalı, tasnif etmeli, yayınlamalı. Dünyada Kürdoloji bilimini 200 yıllık bir tarihi var. Dünyadaki bütün Kürt Enstitüleri ile dayanışma içinde fikir, malzeme, materyal, öğretmen alışverişi yaparak kendi üretimine katkıda bulunacak her yardımdan istifade etmeli. Bütün

bunları yaparken, geleceğin Kürt bilim adamları ve akademisyenlerinin yetişmesini de önüne koymalıdır", diyerek Enstitünün önündeki görevleri herkes tarafından kabul edilir bir tarzda dile getiriyor ve bu konuda oluşturduğu mantık zincirini, Enstitünün çalışma yöntemi, maddi kaynakların kullanılması, bünyesindeki elemanlara karşı izlemesi gereken istihdam politikasını ifade ederek tamamlıyordu.

Değerli Kürt aydını Musa ANTER ise konuşmasında Kürt kültürünün Türk kültürüne yaptığı katkıları anlatıyor ve; "İnanıyorum ki Türkiye'de kurulacak bir Kürdoloji Enstitüsü, Türkoloji kadar Anadolu ve Kürdistan insanına faydalı olacaktır", diyerek, Enstitünün aynı zamanda Türk halkı için de bir gereklilik olduğunu ifade ediyordu.

Enstitünün açılmasını gecikmiş bir adım olarak düşünen değerli dil bilimci Feqi Hüseyin SAĞNIÇ, şu ana kadar ihmal edilmiş dil, tarih, örf-adet ve anenelerimiz, folklorumuz vs. nin araştırılıp, toplumun ve dünyanın hizmetine verme gerekliliği açısından olaya yaklaşıyor ve bu alanlarla ilgili bir çok enstitünün kurulması gerektiğini belirterek, kendi alanı ile ilgili olarak da, Kürtler arasındaki merkezi dil eksikliğine dikkat çekiyordu.

"Bu güne kadar Kürt edip ve şairlerimiz Botan ağzına önem vermişlerdir. Hatta Botan bölgesinde yaşamayan şairlerimizden Feqiye Teyran, Melaye Bate'yi, Siyapoş vb. Botan ağzını esas alarak divanlarını hazırlamışlardır. Biz de Botan ağzını esas alıp, diğer bölgelelerin de sözcüklerini düşünerek işe girişilmesinin yararlı olacağı düşüncesindeyiz."

Kürdistan medreselerinde 15 yıl eğitim gördüğünü ifade ederek yakla-

şık bin sayfalık divan şiiri, Kürt tarihi, Kürt örf ve adetleri ile ilgili destan ve helbestelerinin bulunduğu bir çalışmayı "Dengê Kurdistanê" adı altında seri olarak yayınlayacağını belirten **Abdurrahman Dürre** ise, "Ehmedê Xani'nin dediği gibi, Kürt edebiyatı sahipsiz kıymetli bir meta olduğu için, dünya edebiyatı sahasında gereken kıymet ve revaca sahip olamamıştır. İnaniyorum ki Kürt Enstitüsü, dil ve edebiyatımıza gereken kıymet ve revacı kazandırıp dünya edebiyatı içindeki gerçek yerine oturtacaktır", diyerek Enstitü'nün dil ve edebiyatımız için önemini vurguluyordu.

Geleneksel yaşamın bütün dünyada artık değiştiğini, halkların çağlar boyu kazandıkları deneyim ve birikimlerin insanlığın ortak mirası olarak algılandığını ifade ederek konuşmasına başlayan **Talat İNANÇ**, "Dünyada meydana gelen yumuşama ve gelişmelere paralel olarak, Ortadoğu halklarının yaşamında gittikçe hızlanan ekonomik, toplumsal, kültürel devinim ve bizzat Kürt halkının ulusal ve demokratik mücadelesinin kendisine karşı uygulanan baskıyı geçersiz kalmıştır", demekle ve, enstitü düşüncesini bu sürecin bir parçası olarak düşünmekteydi.

"Bu süreç içerisinde Kürt dili, türküsi, destanı, sevinci, acısı, çöküşü, inancı, bilinci, yakın ve uzak geçmişi, geleceğe bakışı, başka halklarla karşılıklı ilişkileri, dayanışması, geleceğin dünyası içerisindeki yeri ve özlemleri araştırılacak, incelenecek ve irdelenecektir", diyen Talat İnanç, enstitünün önündeki çalışma alanları ve bu çalışma alanlarının sonuçları konusundaki düşüncelerini açıyordu. Ayrıca Kürt dilinin fonetiğine uygun bir yazı dilinin oluşturulmasının gerekliliğini de vurgulayarak bu konudaki boşluğa da

dikkat çekiyordu.

Bilimsel nedensellik ilkesine göre, neden ve sonuç birbirlerini etkileyen iki ayrı olgudur ve bunlar arasındaki diyalektik bağın ortaya konması gerekir. Yine bu ilkeye göre sonuç eğer zararımızaysa, nedenleri değişikliğe uğratarak sonucu olumlayabiliriz. Bu temelde ulusal problemimizin çözümü kesinlikle kurumlaşmış yapılara ihtiyaç gösterir.

Kurum ya da örgüt ise "amaca varmak için gerekli maddi ve manevi kaynakları en kısa zamanda, en iyi verimi alacak şekilde bünyesinde organize etmelidir". Bu gerçek ışığında, kendi gerçeğimizi irdelediğimizde, tarihsel gelişimimizin bu evresinde, bu konudaki düşünsel sürecin henüz tam olarak gerçekleşmediğini görmekteyiz.

Yine ulusumuzun içinde bulunduğu objektif koşulların yarattığı bu olgunun giderilmesi için bir ilk adım atılmıştır. Problemi tesbit etmek, o problemi çözmenin en önemli aşamasıdır. Bundan sonra verilerin toplanması, sınıflandırılması, ve çözüm için gerekli yolların üretilmesi aşamaları gelir. Kanımızca problem teşhis edilmiş ve bu konuda veri toplama aşamasına gelinmiştir. Bu verilerin geniş bir yelpaze içerisinde ulusal sorumluluğumuzun ağırlığına uygun tarzda toplanması gerekir. Enstitü olgusunun oluşumu ile ilgili düşüncelerini ifade eden bütün konuşmacıların ortak noktalar üzerinde birleştiklerini görmek sevindiricidir.

Ancak enstitünün çalışmalarının, gerek farklı alanlarda uzmanlaşmış, gerekse uzmanlaşma eğiliminde olan bütün Kürt araştırmacı ve aydınları tarafından desteklenmesi gerekiyor. Bu kolektivizmin yaratılabilmesi, hem enstitünün çalışmalarının sağlıklı olmasını hem de çalışmaların sonuçlarında ulusumuzun azami ölçüde faydalanmasını sağlamaktır.

Ku jî derdê te keli cerg û hinavê
wi pişîn
Ji evîna te helî ew ku bû wek ta û
derzî

Li dû doza te ku daye dil û dinê
xwe hemî
Li te her tişt ku feda ye çî hebûn
û çî ezî

Tu ku ke'ba dil û canî li te tîn
hec û tewaf
Ser li şemîka te anî dît ku zîka
xwe nezî

Tu kewa perbeleka lat û zinar û
çepela
Werdeka Zap û Firat û Dicle nû
erezî

Zarxweşa seyda bu gorî dêm geşa
kaw û keleş
Çav reşa gerden bi morî kofî xîlya
gevezî

Sorgula xwîna şehîda lê rişî her
rim bijî!
Bulbulam xulxul jî wîda dil kula
ah û xwezî

Şeng û şoxa nav welat e
Al û toxa Kurd xelat
Şeker-û qend-û nebat e
Gewr-û rînda sê kezî

Abdurrahman DÜRRE

Ji nûh ve hewce bikira jîyana min
Ezê biçûma dîsa di vê rê de
Bi strana pêşerojê ve
Ez ne dipaxivim jî nolçe ye
We yê hesinî re

Louis ARAGON

MÎR BEDÎRXAN DESTÛR DA ZEWICANDINA KURD Û ERMENÎYAN

Faîk BULUT

Dîroka tîkiliya Ewrûpa ya Rojhilata Navîn re nuh e. Navenda van tîkiliyên sedsalan berjewendên aborî ne. Mîrov dikare vê demê bibe heta dewra Marco Polo. Wê gave Îtalya dergehê vebûna Ewrûpa ya ber bi Asyayê ve bû. Armanca kesên ku ji Îtalyayê bi re diketin ticarî bû. Wê demê ji Îtalya, di deverê gelek girîng û derê ku li Asyayê vedibû bû.

Tîkiliya duwemîn, di dema pêşveçûna împaratoriya Îslamê de sedemên ya ku heya Îspanya'yê fire bûbû. Dewletên Ewrûpa, dixwestin pêşveçûna Îslamê û belavbûna wê hîn bibin. Ji ber vê yekê ji ji nuh ve xwestin qewmên Rojhilata Navîn binasin û lêkolînan li ser wan bikin. Di pişt re ji êrîşên xaçparêzî dest pê kir. Îca yên ku pêşve diçûn Evrûpayî bûn. Rewşa cîhên ku îşgal kiribûn û tê de derbas bûbûn, ji nêzik ve dîtîn.

Fethên Împaratoriya Osmanî yên heya hundirê Ewrûpa, bûn sebebên tîkiliyên Ewrûpayîyan ên herêmê. Bi şikestina hêzên Osmanî li hember bergeyên Viyanê Osmanî ket pêvajoyek paşveçûnê û herimandinê. Ev rewş ji pir kêrî Evrûpayîyan hat û bû sebebên dest avêtina pazarên Osmanî yên hundirî. Dewletên mêtîngehkar (dagirker) bi vê tîkiliyên xwe re ji dest bi tîkiliyên mêtîngahkarî kirin. Ji vê demê bi şûnde hezrê 100-150 sal anku di salên 1700 û 1800 de welatên rojava yên ku sermayedar bûbûn (kapîtalîst bûbûn) dest avêtine dagirkeriyê, û bi hemû tazibûna xwe ve êdî pirsgirêka "Rojhilat" di rojava wan de hebû.

Ev "pirsgirêka Rojhilat" edî keti bû nav konevaniya (siyaseta) dewletên Evrûpa -Îngilîstan, Frensa- û pişt wan re ji Rûsya virnî ya Çarîtiyê. Ev konevaniya han ji ji bo hilweşandina

Dewleta Osmanî ya pirnetew pê ve ji tiştêk nînbû. Lê berê ev konevaniya perçekirin û parêkirina dewleta Osmanî ji ji hêla dewletên Rojava bi ketina "mîrovê nexweş" dihat îfade kirin. Lê ev konevan li ser xetek ne dimeşiya. Sedemên bûyerên aborî/konevanî carna vê ramana hanê di dane rawestandî.

Carna ji mîna teyrû û tirûdên ku li hêviya nêçîra xwe, bi wê leza ku çav were girtin û vekirinê, ramana xwe pêk dianîn. Bi şeweyek kurt mîrov bibêje Dewleta Rûs ya Çarîtiyê bilêzginî û pêşveçûnê derdikete holê. Dest bi belavîyê dikir. Pêşiyê xakên Qafqasyayê îlhaq kir. Çarîtiya Rûs ji bo Osmanî bû xeterek mezin. Ev rewş ji bo dewletên Evrûpa yên dagirker re ku di Rojhilata Navîn û Rojhilata Dûr de berjewendên wan hebûn bû gefek mezin. Çarîtiya Rûs ku dixwest li ser xakên Qafqasya re xwe berde deryayên germ lê Dewleta Osmanî ji xwe re astengek mezin didît. Ji ber vê yekê çav ji wan gelê ku di binê nîrên Osmanî de dijiyan re dişkand. Mîna Ermenî, Asûrî, Kurd. Rûsya xwe piştvanê xwezayî yên filehên ku di binê nîrê Osmanî de dijin îlan kir. Lê çiqas Îngilîstan û Frensa dixwestin Împaratoriya Osmanî perçe bikin ji ji ber ku perçekirin bi kêrî Rûsya neyê li diji konevaniya (siyaset) xwe ya pêşîn dest bi konevaniyek din kirin. Ev her dû konevanî di navbera salên 1800-1900 de di reqabetê (hevberî) de bûn. Yek jê konevana "mîrovê nexweş" ku dixwest tafilê bimre û gelên ku di sînorên Osmanî de dijin wan bîkşîne bi alî xwe de -mîna Kurd, Ermenî Asûrî (Nastûrî, Keldanî, Suryanî)çî jê bihata tewsîr ne dikir, ku xwediyê vê konevanê Rûsya bû. Çarên Rûs ji Kurd û Ermenîyan re behsa mafên "damezirandina dewletê" an ji "xweserî" yê diki-

rin. Konevana duwemîn ji ya ku nedixwest neha "mîrovê nexweş" bimre û di vê pêvajoyê de ji ji bo jiyandina wî alîkariyê pê re dikirin, ew dewlet ji Îngilîstan û Frensa bûn. A din ev konevanî li hember serhildanan û sergêjahiyên di nava sînorên Osmanî da bûn. Serhildanên Paşayên Misrê û yên Mîrên Kurdan ji ber vê yekê hatin şkandin.

Bê guman, Îngilîstan û Frensa pazara Osmanî ya hundirî zêrandine (lê mijiyane) û bi vî awayî ji aboriya Osmanî serûbin kirine. Ji ber hin bêtir zêrandinê ji, bi navê bangîşeyên (sloganên) "îslehet" û "tenzîmat" ê yên ku ji derva ji hêla konevanên welatên dagirker hatine avêtin ev ji bûne sebebên geremol û sergêjahiyên hundirî. Bilî vê yekê ji him çalakîyên Filehî yên Dewleta Amerîqa yên Yekbûyî û Îngilîstan-Frensa him ji Çarîtiya Rûs di sînorên Dewleta Osmanî de bûn sebebên sergêjî û geremolên nava gelan.

Weka ku li jêrê ji were dîtîn di dawîya "îslehet" ê de gava rewşa gundiyan Kurdan tê pelîşandin, cîranên wan Ermenî û Asûrî ji hêla Rojavayan ve tîn hîmaye kirin û car carna ji li hember Kurdan tîn fitik kirin. Gava Kurd vê yekê dibînin ji alî yê aborî û konevanî ve li hemberî Rojavahîyan derdikevin. Bi vî hawayî gava ku li hember Osmanî serî radîkin wekî ku li hember dewletên Rojava yên dagirker serî rakiribin.

Bê şik çalakîyên Rojavayan ên di nav sînorên Osmanî de dihate kirin bi îfadeyekî tîkiliyên mêtîngehkarî û sermayedarî ne dihate kirin. Olê (din) li gorî pirtûka kedxwariyê bi kar dianîn. Yanî di binê çalakîyên Fîlehî û Mîsyonerîtiyê de mêtîngehkar ji xwe re "altaxan" an ji bi gotînek

mehsûm civatên piştvanek çêdikirin. Bi vî şeweyê ku Fîlehî bûbû navgîna (haletê) Rojavahiyan ên belavbûnê û îşgalkirinê, li dijî vî siyasê jî wekî gelên Kurd, Tirk, Azerî, Îranî, Erebi li hember Rojava acizbûna xwe bi ola Îslamê îfade dikirin. Serhildanên Şêx Ubeydullah bi hîmê xwe ve her çiqas bi girsên gel ve girêdayîbû jî lê belê qadroyên milîtan ji "Feqî" yan pêkdihatin. Ev bûyer jî bi tawrê Rojavayan ve girêdayîbû.

Xala dawî ku emê di binê vî sernivîsê de bahs bikin jî tevgerên milî yên ku ji sedsala 1800 de dest pê kirine. Bi taybetî jî sala 1828 an bi şûn de gelên ku di binê serweriya Osmanî de dijiyan hatibûn niqtekî pêwîst. Lewre di vî demê de hêzên Osmanî du tîkçûyînên mezin standibûn. Artêşên Osmanî xwe li hember artêşên Rûsan ranegirti bûn û jî hev belavbû bûn. Dewleta Elî Osmanî li hember wan vekîşîya bûn. Heke ku Îngilîstan û Frensa midaxle pê nekira dê leşkerên Mîsrê hetanî Stenbolê bimeşîyana. Ev her du mexlûbiyetên (tîkçûyînên) û jî hev belavbûna artêşa Osmanî, di nav Mîrekên Kurdan de bûn sedemên gumanan. Ji xwe re heyêrîn, jî vî yekê bi şûn de Mîrekên Kurdan tîgîhiyan ku êdî ewê nikaribin bi Osmanîyan ewle bibin.⁽¹⁾ Wekî din jî Kurd jî tevgerên milî yên li Balqanan û yên li herêma Kurdistanê -ku bi navê Kurdistanê dihate nav kirin- posîde (tesîr) distendin. Em jî arşîvên Siwêd û Îngilîstanê tîdîgîhên (fêhmî dikin) ku Kurd, modelên rêxistinên xwe jî Arnavudan û netewekariya xwe jî jî tevgerên Ermenîyan standine. Lê jî ber gelemşê (problema) erd, Ermenîyan jî xwe re hinqûf dîtine.⁽²⁾

SERHILDANA MÎR BEDIRXAN

Emê ronî bidin niqteyek serhildana Mîr Bedirxan a ku hindik tê zanîn. Pêşî qala berya serhildanê bikin.

Hawê ku li jor jî hate nimandin (nîşandin) Osmanî ew konevaniyên ku ji hêla Rojavayan ve hatibû spartî, hewce bû ku wan pêkbîne. Mîna konevaniyên "Îslehet" û "Tenzîmat" ê. Ji aliyê aboriyê, ev yek hewce bû. Lewre herêma ku bi navê Kurdistanê tê zanîn heke Mîrekên wê jî holê bîr rakirin û li şûna wan axa bîmînin ev yek jî bû xîzna dewletê qazancek bû. Ya din jî Mîrek jî bo damezîrandina Kurdistanê potansiyalek bûn, lewre ev mîr jî tevgerên netewî posîde distendin. Di demê qelsî ya Osmanî de bi hêsanî karibûn benê xwe bi qetandina. Ji xwe dewleta Osmanî her diçû qels dibû. Dîsa jî, girsên gelên Kurdan piraniya wan koçer û niv koçer bûn, ev yek jî dibûn sebebê ku bac nekeve xîzna dewletê, jî sedemê konevanî ên ku jî hêla ewrûpayîya bi wan dabûn pejirandin jî, rewşa aboriya Osmanî pir nexweş kiribû. Ji ber vî yekê divê Mîrekên Kurda jî holê bihatina rakirin û di şûna wande axayên xwedî erd û feodal bihatina afirandin, adin jî axayên usa bi afirandina ku him keda gundiyan bixwarina him jî bacê bidana dewletê û gelê koçer jî bi cîh bikirna.

Ji hemî van sebeba jî tê xwiyan ku hewciya dewletê jî navendiyê re hebû. Herîmên Kurda jî aliyê aborî û konevanî ve divê biketina bin hukmê Osmanîyan. Ji alî din ve jî ev tedbîr li dijî dewletên ku dixwestin Osmanî perçe bikin hatibû standin. Bi kurtasî Sultan Mahmut II. jî aliyê

navendiyê ve gavên yekemîn avêt. Ji bo jî holê rakirina Mîrekên Kurdan dest bi kar kir.⁽³⁾ Mîrov dikare jî ramana weha ya Mîr Bedirxan jî sala 1820 an bi şûnde debaşê (behs) bike ku ew jî ev e, him parastina mîrekiya xwe û him jî di keysek bi cîh de veqetandina ji Osmanî bû. Mîr Bedirxan jî bo ku dewleta Osmanî bi vî ramana wî nehise, li herêma Mîreşê li dijî artêşa Misîriyan ên ku li hemberî Osmanî serî rakiribûn, şer dike.⁽⁴⁾ Di salên 1830 yî de jî, jî Reşîd Paşa xwe bi serkevtinê dûr dixê. A din jî, sînorên serweriya xwe em dibînin ku Botanê bi tenê nahêle hetanî Musûl-Bexda-Amedê (Diyarbakir) jî fireh dike. Bi taybetî sozê ewlekirinê û seqîrandinê jî sergêjahîyan dûr xistinê, hindik standina bacê dide gundiyan ku tîr pelçiqandinê. Vî yekê jî pêktîne. Gava ku Bedewiyên Ereban jî Bexdayê re dibin xeter, Mîr Bedirxan bi hêzên xwe yê çêkdari diçe alîkariya paşayê Bexdayê.⁽⁵⁾

Bi vî şeweyê fêrmandariya xwe jî yê paşayê herêmê hin bêhtir dike.⁽⁶⁾

Hawê ku li jorê jî hate nimandin Îngilîstan û Frensa jî ber nexwestina perçekirina Osmanî, li hember derketinê serhildanên Kurdan, du tedbîran standine. Yek jê bi alîkariya Osmanî û temirandina navêndên serhildanên Kurdan, ya din jî hîmayê kirin û maf nasîna Fîlehan û li dijî Kurdan fitik kirina wan bû. Wek di herêmên Urmiyê, Wanê, Botanê de hinek mafan dan Asûriyan (Nastûrî, Sûryanî, Kelodanî) û ev yek di nav Kurdan de çevnebariyê derxiste holê û li hinek ciyan jî bû sebebê şerên Kurd û Asûriyan.⁽⁷⁾ Bi rastî jî ev hêrs û rîka Kurdan jî Osmanî û Rojavayan re

(1) Martî van Bruinessen, Peyvandina wî ya, 14.10.1991, li Bîlâr Aş. yê Stenbol

(2) Nuri Şemdin, Bergeh, Îsveç Devlet Arşivlerinde Kürtler, I-2, Wekî din jî

Bilal Şimşir, İngilîz Devlet Arşivlerinde Ermeni Sorunu. Naci Kutlay, İttihat Terakki ve Kürtler.

(3) Konstantîn Petroviç Matiyef, Bar-Mattay, Asuri Tarihi I, Nisibin Dergisi, 22/12-6739, 1898 r. 10

(4) Bar Mattay bnd r. 10, II

(5) Ez bi rastbûna vî libata wî ne bawerim.

(6) Wergerîna Dr. Kaus Kaftan ê jî Kurdistanê Başûr ku jî Dr. Celîlê Celîl yê Kurdên Sovyetê wergerandibû.

Nivîsara H. Güzel ku jî wergerîna zaravayê Soranî wergeranda dibû zmanê Tirkî, kovara Deng, hêjmara 40, 1990, hatibû weşandin.

(7) Bar Mattay bnd. r. 10

bû. Lê belê ji sedema pêşnêrîna teng ev rik û hêrsên xwe di serê cîranê xwe de vala kirin. Bi vî hawayî konevanan kesên jor çê dikirin, tade û janê jî yên jer diditin.

Mîr Bedirxan wê demê xwedî ramana damezirandina dewletek bû, gav avêtinên Qewalalî M. Alî Paşe û Çarîtiya Rûs ji xwe re mînak distend. Li gorî gotinan ji bo têkiliyê bi Rûsan re bike jî xebitiye. Di oxira damezirandina Kurdistanê de bi Mîrekê Wan, Hekarî, Qers û Bazidê re peymanan çêkiriye. Di gola Wanê de hêzên deryayî jî xwestiye ku bi afirîne. Cara yekemîn e ku xwendevanên Kurd ji bo perwerdehê şandîye welatên rojava.⁽⁸⁾

Tiştêk din jî her çiqas mislimanek bi bawerbû jî û alîkariya her mazintir jî kesên bin serweriya xwe dîtibe jî -mîna şêxûlîslam mola Abdulqudus.⁽⁹⁾ di qada olî (dînî) de jî gavên pir pêwîst avêt û Filehan ji xwe re bira îlan kir. Bi Asûrî û Ermenîyan re hevalbendî (ittîfak) çêkir. Niqtek pêwîst e Mîr Bedirxan di hikûmeta xwe de cîhen girîng, mewkîyem pêwîst cihê kir, ji ber ku ji aboriyê û ticaretê baş fêhm dikirin karên malî yên mîrekiya xwe dewrî Ermenîyan kir. Di artêşa Mîr Bedirxan de hejmarek pir jî serbazên (serleşker) Ermenî hebûn. Piraniya wan ji gundê Dîh (dîra) bûn. Bi rastî jî di wê demê de yanî di salên 1830 de gava ku ser eşîrên (serêlên) Kurd hêzdar bûn, pirî Ermenîyan di binê maiyet û serwariya wan de û di nav alîkarên wan de cîh distendin. Têkiliyên xweş û tûnd di nav Kurd û Ermenîyan de hebû û bê tîrs tevî hev dijiyan: Mîr Bedirxan hin bêtir pêş ve çû, danûstendina keçan di nav Kurd û Ermenîyan de serbest kir. Lewre bi yek çavêkî li Kurd

û Ermenîyan dinihêrt. Gava ku xortên Ermenî û keçên Kurd li hev mehr dikirin, (an jî vajiyê vî ya) giregir û rûspiyên Kurda di dêrê de bi berêzdarî li KEŞE temaşe dikirin. Heta di dêrên Ermenîyan de nimej jî dikirin. Vajiya vî jî li dadgehên (mahkeme) şer-î (ji bo mehrê) û li mizgefta dibû. Ermenî dikaribûn li mizgeftan ayînen xwe bikirana.⁽¹⁰⁾

Têkilahiyek weha bi gelên Asûrî (Nastûrî, Sûryanî, Keldonî) re jî hebû. Wê demê Asûrî bi aliyê konevanî ve bi paşayê Erziromê ve gîredayî bûn. Lê di pêkanîne de leşker didan mîrê Hekarê. Mîr Bedirxan ji bo Amedekirina serhildanê, pêşewayê (pêşeng) Nastûriyan Mar Şemun bi nunêrî (mümesîl) şande ba Padîşahê Osmanî. Ev yek jî perçek hazîrî û tedarekê serhildanê bû. Wekî din tevdîra (plan) serhildanê bi Mar Şemun da xwendinê jî.⁽¹¹⁾

ŞERÊ KURD Û ASÛRIYAN

Hetanî salên 1840 têkiliyên Kurd û Asûrî yên ku bi biratî dimeşîya ji ber sebebên jor û xebatên mîsyonerên Îngilîstan û Emerîqan û fênekiyan wan, ev têkiliyên baş xerab bûn. Ev tişt hate devereke wisa, Awrûpayîyan bi diravan (pere) mirovan kirin û di pêşberî Filehan de wan pêşkar kirin. Ew axayên ku bertîl dabûbûn wan, ajotin ser pîrozgeh û dêrên Nastûriyan.⁽¹²⁾

Hêzên Rojava têgihiyan ku bi her awayî Mîr Bedirxan di babeta serhildanê de biryardar e. Bi taybetî Îngilîstan û Frensa bi çalakîyên mîsyonerî û Emerîka jî bi mirovên xwe yên mîsyoner dest bi karên xwe kirin û bi van çalakîyên xwe Kurd û Asûriyan pêşkarê hev û din kirin. Ji ber vê ye-

kê bi Asûriyan re alîkariyê kirin û bi nûnêrên Tirk û Îngilîstanê re yên li Musûlê wan anîn ba hev.⁽¹³⁾

Paşayê Musûlê Mehmed, ji bo ku Mar Şemun li hember Mîr Bedirxan serî rakê, pêkutyê lê dikir. Îngilîz Bagder û Grant jî him nehiştin hevalbendiya wan here serî û him jî bûn sebebê ku Nastûrî bacê nedîn Mîrekiyên Kurdan. A din jî bi Mar Şemun ala Îngilîstanê kişandin qerargaha wî.⁽¹⁴⁾

Pişt re jî heystê elên Nastûrî ku hêza wan ji 11000 pêk dihat, hêrîş birin ser gundê Kurd a Pervariya jorîn. Du zilamên Mîr Bedirxan ên ku pir hatibûn nasînin, kuştin. Di vê navê de jî Mar Şemunê ku bi dek û dolabên Îngilîza nasîn, kuştin. Di vê navê de jî Mar Şemunê ku bi dek û dolabxên Îngilîza hatibû xapandin ji bo "kuştina Kurden misilman" fermanek belav kir.⁽¹⁵⁾

Sedema vê yekê hêzên Mîr Bedirxan dest bi libatên xwe dikin û gundên Nastûriyan di nav agîr û xwînê de difetîsînin. Diya Mar Şemun ji hêla leşkêren ve tê kuştin. Mar Şemun di mala jinek Nastûrî de xwe vedişêre û dûre jî pêneyî (xwe davêje baxtê) waliyê Musûlê Mehmed Paşa dibê. Mar Şemun hêzên Îngilîz û Frensê dixê libatê.⁽¹⁶⁾

Hawê ku Musa Anter ji belgeyek diguhêze û dibêje ku Mar Şemun destek biriyayî yê pîrekek dişîne ji qralîçe Îngilîstanê re û jê alîkariya wan ji bo ku wan ji "Kurdên hov" bifi-litîne dixwaze.

Di vê navbêrê de eşîrên Kurda di Tîrmeha sala 1843 de digrin ser eşîra

(8) Beleş Şerkoyî, El Kadiye El Kurdîye (Geleşa Kurd), ê ku diguhêze : Deng, wnd.

(9) Abdullah Yaşin, Bütün Yönleriyle Cizre, Yücel matbaası, 1983 r. 144

(10) Berhema ku bi Ermenîkî hatiye nivisandinê diguhêzîne, Deng, wnd. r. 27

(11) Safrastîn, Kurds and Kurdistan, London, 1948, ê ku diguhêzîne, Deng, wnd. r. 27.

(12) Bar Mattay, bnd. r. 12.

(13) bnd. r. 10 II

(14) Deng, wnd, r. 7

(15) Abdullah Yaşin, bnd. r. 145

(16) Abdullah Yaşin, bnd. r. 145

Nastûriya ku li Tiyyariya jorîn in. Milîsên Nastûriyan hemû belavdibin. Li hev xistin çil roj didome, ji her du aliyên jî pir mirov tîn kuştin. Ji pêşewayê berxwedanê Malek Smacîl (Şimayil) birîndar dibe. Milîsên Nastûriyan ên ku ketibûn çeperê jî di şikeftê çiya de pêne dibin. Di vî şerî de çil û pênc leşkerê Kurd tê kuştin. Mîr Bedirxan, Malek Smacîl jî zilmên xwe kuştî an jî zindî dixwaze û alikî ve jî hêzên Mîr Bedirxan çeperê li hêzên Nastûriyan teng dikan. A din jî ji bo rawestandina şer teklîf li hêzên Nastûriyan dikan. Ji nava leşkeran yek: "Çekan ne teqîn ez li ser xîreta xwe sond dixwum ku Mîr Bedirxan tu xerabiyek bi we nake. Tenê bi we re dixwaze bipeyîve", dibêje. Malek Smacîl ku gelek di rewşek bê hêvî de bû, hevşewîrandina bi Mîr Bedirxan re dipejîne. Nastûrî jî şkeftan derdikevin. Tevî hev li rastê çar milîs mabûn. Malek Smacîl tînin pêşberî Mîr Bedirxan. "We çî bi dest xist? Me bi hev re hevalbendiyê çê bikira, me bi hev re serî hilda û we baweriyê bi gotinên wan ne aniya, baca xwe bida hin bêtir baş nedibû?" ji Malek Smacîl dipirse. Lê belê pêşewayê Nastûrî vê bersîvê dide: Ez ji kirina xwe nepoşmanim. Ji bo bibe îbret ji nîfşên Asûrî yên ku bîn rê, min cizyeyê neda. Belê te qet ji xwe pirsî di vî şerî de çî bi destê min ket? Binihêre pir xwîn hate rijandin. Heta yekî Asûrî biketa hindiktirîn pênc peyayên Kurd dikuştin Min bi serê xwe tenê 81 kesên kuşt. Ez eşkera bipeyîvim ku ne ji yawerê te bûya, xwe ji te re nekiribûya sîper, dê kesê 81. tu bûya yî."

Mîr Bedirxan jî vê peyvandina eşkera hez dike û vê teklîfê li Malek Smacîl dike. Ola Îslamê bipejêre û beşdarî me bibe. Te bikim Mîrê Hezarê yê mezintirîn.⁽¹⁷⁾ Pêşewayê

Nastûrî dibersivîne: "Mîrovên Asûrî serên wan bîn birîn jî, ola xwe naguhêrin. Lê belê dibe ku ez karibim qencyek bi te bikim." Mîrê Kurd dipirse: "Çî ye?" Bersîv wekî jêrê ye: "Ji pîrekên xwe yekî bide min. Ez pê re rakevim, belkî ji we Kurdan re zarokek merxas bîne bi vî hawayî ji we re pêşengiyê bike ku hun ji binê nîrê Osmanî bifilitin..."

Mîr Bedirxan jî van gotinên Malek Smacîl Hêrs dibe û şûrê xwe jî kalên dikşîne li nav serê wî dixê û dike du felq. Lê ji gotinên wan peyvan jî dûr namîne: "Ne Tirk û ne jî Kurd nikarin van mirovan bişkênin. Lewre xweşkahiyan jiyanê ji bo wan tiştê têgeh nake. Hun jî di şûna wî de bûna dê vê bersîvê bidana."⁽¹⁸⁾

Mar Şemun jî, piştî temasên ku li Bexda û li Musûlê bi Fransîz û Îngilîzan re kiribû û bi alîkariya Waliyê Musûlê Mehmet Alî Paşa dest bi pêkûtiyê li ser Osmanî kir.⁽¹⁹⁾ Îngilîz û Frensîz jî bo şkandina serhildana Mîr Bedirxan pêkûtiyê li Bab-i Aliyê dikan.⁽²⁰⁾ Hukûmeta Osmanî pêşiyê biraziyê Mîr Bedirxan dikirin. Em dixwazin bidin nimandin ku Ezdîşêr (Yêzdanşêr-Erdeşîr FB) bi saya serê diya xwe ya ku amadekirina serhildanê de gelek beşdariyên wê hebûn, bûbû pêşewa.⁽²¹⁾ Ev yek di têgeha dîrokê de divê ku bê lêgerîn kirin.

Piştî şikestên artêşên Mîr Bedirxan leşkerên Asûrî yên ku bi serokatya Mar Şemun fetilbûn herêmê, li gundên Kurdan dest bi qir kirinên dikan.⁽²²⁾ Piştî van dema jî xwe hêrîmên Kurd dibin cîh û warên hev qir kirinên netewekarî û li hev xistinên etnîkî.

Niqteya ku em dixwazin bal bixşînin ev e ku tevgerên Kurd yên ku li

hemberî pêşeriyên dijmin tekoşînê din, li dijî civatên olî û etnîkî yên ku li herêmê dijîn divê ku konevaniyek pir girîngî ji bo wan bişopînin. Dewletên biyanî û hêzên serwer ên herêmê dibe ku ji hinek tiştên Kurdan ên paşdemayî û pêşdariziyên (ol, mezhep, eşîrî, xwîndarî) wan îstifade bikin û civatên etnîkî yên Rojhilata Navîn bixşînin ber bi alî xwe ve.

Sûryaniyên dorhêla Midyadê yên ku ji hêla hêzên tarî ve hatin kuştin, yêzidiyên dorhêlên Amed û Sêrtê yên ku ji alî axayên (axayên sûnî) Kurd li wan tahde dihate kirin û ji bo malên xwe ji wir bar kin, gundê **Keldanî** yê ku ji xwe hebek bi tenê bû li Beytulşebabê, mêrên wan bi darên zorê dikirin çetê gund (milîsê gund) û paşê jî dihatên nefî kirin, hemî dek û dolabên, fêrên vê berhevdayî yê.

Ev li hev xistinên netewekarî û etnîkî yên li welatên Qafqasiya, li Rojhilata Navîn û Balqanan hemî jî, ketina dewletên emperyalîst ên herêmê û ji ramyariya (îdeolojiya) sosyalîst ya li paş ketiyê tê. Dibe ku ev tişt bihesike me jî. A din jî dibe ku dek û dolabên li hev xistinên, Tirk-Kurd, Nastûrî-Kurd an jî Misliman-File an jî Kurdê Elewî-Kurdê sûnî bê têzga kirin. Jiber ku ji dîrokê sey (ders) bê stendin me dest avête vê babetê û qewimandinekî tîpîk me raxiste ber çavan.

Mîr Bedirxanê ku di navbera Kurd, Ermenî û Asûriyan de zewcandinê serbest kiribû, bilî Kurdan ku ji gelê din jî mirovan xistibû nav civata xwe li hember qewimandina nebûbû astengê li hev xistina gelan, ên ku mîna xwişk û birayan nêzîkî hev bûn.

(17) Guhêzandin ji kovara Nsîbîn, 27/14-6739, 1990, r.24

(Piştî xweş lê nihêrtina Mîr Bedirxan li ser olê ku min li jor dîtibû ev yek ji min re rast nehat F.B.)

(18) Nsîbîn, wnd. r. 24

(19) Abdullah Yaşin. bnd. r. 145

Wekî din jî Em. Alb. Nazmî Sevgen, Doğu ve Güneydoğu Anadolu'da Türk Beylikleri. 1982.

(20) Abdullah Yaşin. bnd. r. 145-146

(21) Bergeh, İsveç Devlet Arşivlerinde Kürtler

(22) Bar Mattay. bnd. r. 12

PEYVÎN...RÖPORTAJ...HEVPEYVÎN...RÖPOR

*Dergimiz **REWŞEN** adına, 10 Ocak 1992 günü değerli bilim adamı Sosyolog Dr. İsmail BEŞİKÇİ ile kültür üzerine yaptığımız bir röportajı yayınlıyoruz.*

REWŞEN : Sayın Beşikçi, Türk kültür ve sanatında, üstü örtülü bir biçimde de olsa, Kürt kültürünün etkisi büyük olmuştur. Ancak, yakın bir gelecekte Kürt kültüründe hızlı bir netleşme bekleniyor. Kültürel değerlerin birleştirilmesi ve bu netleşme, sizce bugünkü Türk Kültürünü nasıl etkileyecektir? Öte yandan, neredeyse bin yıldır bir arada yaşayan Kürt ve Türk halkları ortak kültürel değerler de yaratmışlardır. Bir aydın ve bilim adamı olarak sizin bu konudaki düşünceleriniz nelerdir?



Sosyolog Dr. İsmail BEŞİKÇİ

İ. BEŞİKÇİ : Bu soruyu, Türkiye Cumhuriyeti'nin asimilasyon politikası çerçevesinde düşünmek gerekir. Cumhuriyet tarihi boyunca, bir taraftan Kürtlerin, Kürtçe'nin, Kürt kültürünün varlığı inkar edilmiş, bir taraftan da, Kürtlere ilişkin, Kürtleri çağrıştıracak bütün maddi ve manevi değerler yok edilmeye, çarpıtılmaya çalışılmıştır. Çarpıtmanın, yok etmenin en önemli yollarından biri de asimilasyondur. Bu çerçevede Kürt folklor ürünleri, Kürt dilinin ve Kürt edebiyatının ürünleri gaspedilmiş, Türkleştirilmiş, Türklere, Türk kültürüne maledilmeye çalışılmıştır. Şarkılarda bunu bütün açıklığı ile görmek mümkündür.

Kürtler kendi kimliklerine, kendi ulusal değerlerine sahip çıktıkça Türkiye Cumhuriyeti'nin bu gaspçı politikası daha fazla deşifre olacaktır. Kül-

tür düşmanlığı, çirkinlik daha açık bir şekilde ortaya çıkacaktır. Örneğin, Türkiye Cumhuriyeti Devleti, Bitlis oyunları, Hakkari oyunları ile Avrupa alanlarında uluslararası bir yarışmaya katılamayacaktır. Hakkari'nin, Bitlis'in oyunlarını, Türk folklorünün bir ürünü olarak yarışmaya sokamayacaktır. Çünkü artık, Kürtlerin yoğun tepkileri ile karşılaşacaktır.

İki halkın, Türk ve Kürt halkının, bin yıldır meydana getirdiği ortak değerler de vardır. Bu kültür ürünlerindeki Türk ve Kürt öğelerinin belirtilmesi, araştırma ve inceleme kurumlarının, enstitülerin faaliyet alanına girmektedir. Bunun için de demokratik bir ortamın oluşması, gaspçı zihniye-

tin tamamen terkedilmesi gerekir. Türk kültürüne ve Kürt kültürüne ilişkin her konunun demokratik ve özgür bir ortam içinde konuşulması, tartışılması gerekir.

REWŞEN : Kürt ulusal mücadelesi yeni değerler yaratıyor, yeni ve ileri bir yaşama biçimi oluşturuyor. Böylece Türk halkının yaşama biçimiyle bir farklılaşma sözkonusu olacak. Bu durumda, halkların birliğini sağlamak için neler gerekiyor?

İ. BEŞİKÇİ : Kürt ulusal mücadelesinin yeni değerler ortaya çıkarması çok doğaldır. Bu mücadele yeni bir yaşama biçimi de oluştur-

yor. Ulusal mücadele geleneksel Kürt toplumunun yapısını kökten sarıyor, değerleri alt-üst ediyor. Yeni yeni değerler ortaya çıkıyor. Uluslaşma ve özgürleşme hem duygu olarak, hem de düşünce olarak gelişiyor. Bütün bunlar Kürt ve Türk halklarının birliği için engel değil. Bu birliğin, ancak, demokrasi ve özgürlük ortamı içinde gelişip kökleşebileceği bilinen bir gerçek... Böyle bir ortam içinde, özellikle, Ankara, İstanbul, İzmir, Adana, Bursa, Konya gibi metropollerde ve büyük şehirlerde, sık sık Kürt kültür ürünlerinin, el sanatlarının, halk danslarının, resimlerinin vs. sergilenmesi çok önemli bir görev olarak belirmektedir.

REWŞEN : *Kürtlerin yükselen devrimci mücadelesi, beraberinde kültürel atılımlar da getirecektir. Bugün sıradan Kürt insanı, dünyada ve ülkesinde yaşanan olayları oldukça net ve doğru haberalma olanaklarını yaratmaktadır. Sokaktaki Türk insanı ise, resmi ve resmi olanlara göbekten bağlı medya tarafından neredeyse "düşürülmeye" çalışılıyor. Bunun ne gibi sonuçları olacaktır? Aydın, sanatçının, bilim adamının bu bağlamda Türk halkına karşı sorumlulukları sizce nelerdir?*

İ. BEŞİKÇİ : Kürt toplumunda, Kürdistan'da yükselen ulusal ve toplumsal kurtuluş mücadelesinin beraberinde kültürel atılımlar getirdiği de bir geçektir... Kürt insanları artık, cezaevlerini, vahşeti anlatan romanlar, şiirler, hikayeler, tiyatro eserleri, anılar vs. yazıyorlar... Müzik, resim, tiyatro gelişiyor. Kürt gerillaları anlatmak için çok büyük bir çaba sarfediliyor. Bu konuda önemli projeler geliştiriliyor. Cezaevlerini, gerilla mücadelesini anlatan yazılar, resimler, tiyatrolar, müzikler, şiirler... hergün biraz daha çoğalıyor...

Bu süreç içinde, Türk basınının,

Kürdistan'da hiç etkinliği kalmamıştır. Türk basını, Kürdistan'da inanılır ve güvenilir değildir. Örneğin, günümüzde Kürdistan'da kontrgerilla, hergün insan öldürmektedir. Devlet terörü yaygın bir şekilde çalışmaktadır. Buna rağmen, Türk basını kontrgerillanın eylemini kamuoyuna duyurmamak için özen göstermektedir. Kontrgerillanın eylemlerine, adam öldürmelerine en ufak bir eleştiri getirmemektedir. Halbuki, Türkiye Büyük Millet Meclisi'nde, 6 Kasım 1991 tarihinde yapılan yemin töreni sırasında, "ben ve arkadaşlarım bu yemini anayasa baskısı altında okuyoruz," diyen milletvekilinin tavır ve davranışı, Kürt milli renklerini taşıyarak kürsüye gelen ve yemine Kürtçe olarak, "bu yemini Türk ve Kürt halklarının kardeşliği için yaptım," diyen milletvekilinin tavır ve davranışı, Türk basını tarafından, büyük suçlamalarla, yorumlarla Türk kamuoyuna aktarılmıştır. Böyle bir basının, Milli İstihbarat Teşkilatı'nın bir şubesi gibi çalışan bir basının, kamuoyunda inanılır ve güvenilir bulunması elbette mümkün değildir.

Yine bunun gibi, Türk basını, kontrgerillanın Kürdistan'daki cinayetlerinin anlatılmasından, devlet terörünün haber olarak verilmesinden özenle kaçınıyor ama, Üveys Öcalan'ın, Halkın Emek Partisi Birinci Olağanüstü Kongresi'ne katılması konusunda, günlerce aleyhte propaganda sergileyebiliyor.

Türk güvenlik güçlerinin, Kürt gerillalara karşı sürdürdükleri savaşta çok büyük kayıplar verdikleri çok açık bir gerçektir. Asker, polis, özel tim kayıplarının günden güne arttığı da bilinmektedir. Bu durum karşısında çeşitli yerlerde analar, babalar, çocuklarını askere göndermemenin yollarını aramaya çalışmaktadırlar. Bunlara rağmen, bu tür haberler de Türk basınına hiç yansımamaktadır. Fakat, Kayseri, Erzurum gibi yöreler de meydana getirilen kıskırtıcı mitingler, gösteriler, Türk basını tara-

findan eksiksiz verilmektedir.

Bu süreçte aydının, sanatçının, bilim adamının çok büyük sorumlulukları vardır. Aydın, sanatçı, bilim adamı, PKK'nin mücadelesi konusunda, Türk halkına çok sağlıklı bilgiler vermelidir. Kürtlerin kendi yurtları için, Kürt ulusunun onuru ve eşitliği için savaşım verdiği anlatılmalıdır... Devletin Kürdistan'da yoğun ve kapsamlı bir devlet terörü uyguladığı, Kürtlerin maddi ve manevi bütün zenginliklerini gasbettiği belirtilmelidir.

REWŞEN : *Ulusal kültürün devrimci ya da tutucu işlevi konusu yaygınlıkla tartışılıyor. Sizce böyle bir ayırım olabilir mi? Olabiliyorsa, ulusal kültür ne zaman devrimci ve gelişimci, ne zaman tutucu bir işlev ortaya koyar?*

İ. BEŞİKÇİ : Ulusal kültürün devrimci ya da tutucu işlevinden söz edilebilir. Sömürge ülkeler, Kürdistan gibi sömürge bile olamayan ülkeler söz konusu olduğu zaman şöyle söyleyebiliriz : Eğer bir kültür ögesi, direnişçi özler taşıyorsa, bünyesinde başkaldırı özler varsa, bu özler başkaldırıya, yani zulme ve haksızlığa karşı başkaldırıya hizmet ediyorsa... ulusal kültürün devrimci işlevinden söz edilebilir.

Örneğin Kürt şarkılarını ele alalım. Kürt şarkıları acılarla yüklüdür. Şarkılarda dile getirilen acılar dinleyenleri de hemen etkilemektedir. Bu acılar bazan insanların yüreğini yakmakta, kavurmaktadır. Uzmanlar, Kuzey Kürdistan'da söylenen bu şarkıların daha saf, daha otantik olduğunu söylemektedirler. Güney Kürdistan'daysa Arap etkisi olduğu belirtilmektedir. Bu şarkılarda, örneğin kocası jandarma tarafından öldürülen bir kadının duyguları; evleri, askerler tarafından yakılan, yıkılan insanların çaresizlikleri; dedesi, babası, amcası, kocası, kardeşi vs. tutuklanan, hapis-

haneye götürülen kadınların feryatları dile getirilmektedir. Hükümet güçleri karşısında firari olup dağa çıkanların yığıtlıkları anlatılmaktadır. Kürt insanları, bu şarkılarda, çoğu zaman çaresizliklerini ifade etmektedirler, yoksulluklarını, sahipsizliklerini dile getirmektedirler. Kürt insanları, çaresizliklerini, güçsüzlüklerini, yoksulluklarını, yoksul bırakıldıklarını, şarkılara dökerek kendilerini ifade etme, rahatlatma yolları aramışlardır. Birbiri üzerine yığılan dertlerini, acılarını şarkılara dökerek hafifletmeye çalışmışlardır. Bu şarkılar her ne kadar sahipsizliği vurguluyorlarsa da, büyük, yoğun bir öfke birikiminin teşekkül ettiği, mayalandığı da açıktır. Öfke birimi, intikam duygusu bazan, başkaldırı öğelerini bünyesinde barındırabilmektedir. Zulme karşı, haksızlığa karşı, adaletsizliğe karşı başkaldırı duyguları yeşerebilmektedir. Ve bu duygular ve düşünceler, koşullar elverişli olduğunda devrimci ve demokratik harekete kanalize edilebilmektedir. PKK'nin en önemli başarılarından biri, Kürt halkının ruhunun derinliklerindeki kini ve öfkeyi yakalayabilmesidir, bunu devrimci ve demokratik harekete kanalize edebilmesidir.

Kürt halkı kendi içinden çıkan eşkiyaya da çok büyük bir saygı duymuştur. Eşkiyaya destek vermiştir. Eşkiyanın hükümet güçleriyle, askerlerle giriştiği mücadelelerde, hep, eşkiyaya yardımcı olmuştur. Eşkiyanın şahsında kendi öcünün, kendi intikamının alındığını düşünmüştür. Kendisinin yapmak isteyip de yapamadığını eşkiyanın yaptığını görünce, ona coşkuyla yardım etmiştir.

Kürt gerillalarının, Kürt halkıyla ilişkileri kuşkusuz çok farklı bir olay. Hesaplı kitaplı olan, belirli bir örgütün direktifi altında çalışan, silahın neden kullanılacağını, nasıl kullanılacağını bilen, kendi gücünü ve düşmanın gücünü iyi hesaplayan, özgürlük, ulusal onur, ulusal eşitlik, ulusal bağımsızlık gibi evrensel değerleri de

kucaklayan, bir amacı gerçekleştirmeye çalışan gerilla, kuşkusuz çok farklı bir olaydır. Kürt halk yığınları gerillayı da çok iyi kavramış, büyük bir coşkuyla destek vermiştir. Çok kısa bir zaman içerisinde gerilla ile bütünleşmiştir.

Yüreklere yakan, kavuran Kürt şarkıları, bu şarkılarla yansıyan acı, büyük öfke ve kin, Kürt halk kitlelerinin gerillalarla bütünleşmesinde büyük rol oynamıştır. Zira Kürt halk şarkılarında, haksızlığa ve zulme başkaldırı özele her zaman var olmuştur.

Kürt halk yığınları, gerillaların düşüncesiyle ve eylemiyle bu acıların ve bu zulmün bitebileceği konusunda önemli bir bilince ulaşmıştır.

REWŞEN : *Kültür, sanat ve bilim açısından "yeni dünya düzeni" hakkındaki görüşleriniz nelerdir ?*

İ. BEŞİKÇİ : Yeni Dünya Düzeni kavramı, Türkiye'yi çok yakından etkilemektedir. Çünkü, Yeni Dünya Düzeni kavramını oluşturan en önemli boyutlardan biri sosyalizmle ve Sovyetler Birliği'yle ilgilidir. Sosyalizmin ve Sovyetler Birliği'nin geri çekilmesi, çözülmesi dünya düzenini çok yakından ilgilendiren konular olarak belirmektedir. Bu durumda ABD tek süper güç olarak kalmaktadır. ABD'nin tek süper güç olarak kalması Türkiye'yi ve Türk sağ akımlarını büyük endişelere sevk etmektedir. Türk sağı Sovyet Sosyalist Cumhuriyetleri Birliği'nin bu kadar kısa bir süre içinde dağılmasını, Rus komünizminin bu kadar kısa bir zaman içinde çözülmesini, çöküşünü endişelerle izlemektedir. Çünkü Sovyet Sosyalist Cumhuriyetleri Birliği, ABD'ye karşı önemli bir denge oluştuyordu. Bu ilişkiler içinde, ABD Türkiye'yi yanına çekebilmek için, Sovyetler Birliği karşısında daha güçlü görünebilmek için, hassas olduğu konularda, Türkiye'ye arka çıkmayı temel bir görev olarak benimsiyordu. Bu ilişkiler içinde, Türkiye'nin has-

sas olduğu konuların başında elbette, Kürt sorunu geliyordu. Bu ilişki, uluslararası kurumlarda, Kürt sorununun gündeme gelmesini engelliyordu.

Sovyetler Birliği'nin çözülmesi, Kürt sorunun önemli bir açılım kazanmasına neden oldu. Burada tarihsel bir terslik var. Sosyalist devletler, Kürt sorununda hiçbir zaman Kürtlerin yanında yer almadılar. Hep, Kürtleri ezen faşist devletleri ve sömürgeci devletleri desteklediler.

Kürt sorununun bugün, uluslararası gündemin baş sıralarına gelip oturmasında, Kürdistan'da gelişen ve güçlenen iç dinamikler, örneğin, gerilla mücadelesinin çok büyük rol oynadığı besbellidir. Fakat uluslararası dengelerde görülen değişiklikler de, Kürt sorunun yeni yeni açılımlar yapmasına neden olabilmektedir.

Bu süreç içinde, Kürtlerde sanat, bilim, kültür, dil, edebiyat vs. gelişebilir. Kanımca, Kürtler Yeni Dünya Düzeni içinde, kendi kimliklerine daha çok sahip olacaklardır. Bu süreç, Yeni Dünya Düzenini düşünen ve gerçekleştirmeye çalışan bütün güçlere rağmen oluşacak bir süreçtir.

REWŞEN : *Yukarı Mezopotamya Kültür Merkezi hakkındaki düşünce ve önerilerinizi alabilir miyiz?*

İ. BEŞİKÇİ : Kürtlerin maddi ve manevi bütün kültür ürünleri sömürgeci devletler tarafından gasbedilmiştir. Çeşitli araçlar kullanarak Kürt kültürünü yok etmek sömürgeci devletlerin vazgeçilmez bir amacı olarak ortaya çıkmaktadır. Bu durum karşısında, Kürt diline, Kürt edebiyatına, Kürt folkloruna vs. sahip çıkmak, kültür ürünlerini derleyip toplamak gerekir. Bunları, kitaplarla, konferanslarla, sergilerle, konserlerle vs. Kürt ve Türk kamuoyuna, dünya kamuoyuna duyurmak da gerekir. Yukarı Mezopotamya Kültür Merkezi'nin bu süreçte çok önemli bir fonksiyona sahip olacağını düşünüyorum.

GELÊ KURD Û WÊJEYA KURDÎ

Abdurrahman DÜRRE

Ji lêkolînê zaniyarîti û (bilimsel araştırmaya) nişaneyê dîrokî (mêjûyî) û belgeyên zaniyariya kolînî (arkeolojik belgeler) hatiye zanîn ku:

Gelê Kurd, ji koma gelên kevnare yê Mezopotamya û Hind û Ewrûpa (Ari), beşa Îranî ye.

Bi nêzikî (teqrîben) sêhezâr (3000) sal beriya Zayînê (Mîladê) ew gelên, ku bi navê "Gotî-Cûtî, Kûtî-Kûrtî, Koşî, Kasî, Lolo-Lolobom", li der û dorê çiyayê Zagrosê jîne; di pey wan re jî, ew ên, ku bi navê Qardo, Xaldî-Urartû, Sobarî, Nayrî û Hûrî-Mitanî û yên din, ku li çiya û deşt û newal û war û zozanê Kurdistanê jîne, hemû ew gel pêşiyên Kur-

dê îrone û bav û kalên me yên kevnarene û şêr û piling û rimbaz û cengavarê niştimana mene.


Pisporên rojhilatê (doğu bilimcileri), li ser vî qas bûne yek ku:

Qardo, Qardoxî, Kartoxî, Gurdî, Gurtî, Sirtî, Kîrtî, Gordiya, Kardo, Kardavya, Kîrat, Karadaya, Qartawaya û navên din ên wekî wan, hemû navên gelekî kevnare û dîrokîne ku ew gelê Kurd bixwe ye. Ewan navan, gelên cînarê wan ê hemdemî û pisporên gelên biyanî, bi devek û zaravê xweyê cûr-be-cûr, li wan kirine û jêra gotine.

Her wekî ku gelê Qoreyê, ji Tirka ra dibêjin: Toygî, Japonya dibêjin Torkocîn, Çiniya dibêjin Tukiya, Ewropiya dibêjin Turks...

Gotiya, di beriya Zayînê da sala (2646) Sûmer û Akadan, di meydana ceng û şer da şikestandine, bindest kirine, welatê wan girtine û 125 salan di bindestê xwe da hêştine û li wan fermandarî kirine; di Nîjpûrê da, belgekî bi dest ketiye ku têda navên bîst û pênc Qiralên Gotiya nivîsandiye.

Li ser vî awayê, kîfşe bûye û hatiye zanîn ku: Di dîroka gelê Kurd ê kevnare da, împaratoriya Gotiya yekemîn împaratoriya kevnare ya gelê



Abdurrahman DÜRRE

JÎNA ABDURRAHMAN DÜRRE

Di sala 1930'an, dema kuştin û qirkirina gelê Zilan da li Melazgirê qopaniya (nahiye) Diknugê, gundê Kêranlixê hatiye dunê.

Pêşî li cem bavê xwe Hacı Nusredîn xwendiyê paşê jî di medreseyên Kurdistanê da 15 salan li cem seydayên bajare, xwendina xwe qedandiye û destûrnama xwe standiye. Dûra bi qasê deh salan, di medreseyên Kurdistanê da seydatî (mamostayî) kiriye.

Navbera sala 1962-1979'an miftîti kiriye. Di sala 1971 da jî bo doza Kurdîti, li Enqerê mehekê di zindanê da dimîne. Ji wir, radikin Diyarbekirê. Dadkeriya wî (mehkema wî), bi beratbûnê encam dibe. Di sala 1980-1983'an da jî li Libyayê, bajarê Trablusê Xerb da, wergeriya (tercumanîya) zimanê Erebî û Tirkî kiriye. Di sala 1990'an da jî bi dawa endamîti û alîkariya PKK'yê du mehan li Mûşê 20 rojî li Erzîncanê di zindanê da dimîne. Dadgeha Erzîncanê du sal û niv ceza didê. Dadgeha bilind (yargıtay) wî berat dike. Bi kurtî, ji roja ku bîrebirê xwe bûye heta îro, jî bo doza Kurdîtiyê serê wî (herwekî her Kurdê ku xwe nase) di teqereq û gijayêdaye. Zorbe û paşvemayan, tu hêsayî nedanê.

Bi navê "Din Perdesi Altında Sakallı Yılanlar" û "İlahi Sır ve Hikmetler", du aferînekê wî hatine çapkirin û weşandin. Bi navê "Dengê Kurdistanê", nêzikê hezar rûpelan jî helbeste, xezel, çîrokê risteyî (destan) nivîsiye. Wê di nêzda bi navên EVÎN, ŞÎRÎN, BÎRÎN, GÎRÎN, ÇÎROK û DÎROK bêne weşandin.

Zimanê wî yê dayîkî Kurdî ye, di gel wî jî zimanê Erebî, Farsî, Osmanî, Tirkî rind dizane, hindek jî Îngilizî dizane, bi taybetî di wêjeya Kurdî, Erebî, Farsî da zaniyar e. Eva demeke jî, ku di Navenda Çanda Mezopotamya Jorîn da (Yukarı Mezopotamya Kültür Merkezi) seydatiya wêjeya Kurdî dike.

Kurd damezirandiye û cihek wî yê pir girîng heye.

Împaratoriya duwemîna dawî jî, împaratoriya dewleta Med-Mad bûye, ku di sala heftsed (700) ê beriya zayînê da, li Haqbetanê (Akbetan--Hemedan) hêmê wî, ji aliyê çend Eşîrê Kurda yên ku hevgirtine û bûne yek, hatiye avêtin, qiralê wê yê pêşîn Keyqubadê Kurd bûye. Kiyaksar jî qiralek pir mezin bûye. Nînewaye ji Asuriyan sitandiye, Dewlêta Asurî qedandiye, di sala 550 yê beriya zayînê da, Kûrûşê Mezin (Cyrus), (kû kûrê Mandana keça Astiyag û prensê Axemenîşî-Acheamenîde) û hêrîş da ye Medyayê, (Kurdistanê) kalê xwe yê Astiyag li Haqbetanê dîl girtiye û text û tacê wî jê standiye û Medya û Persiyayê gihandiye hevdû û kiriye yek û bûye qiralê herdûya.

Wilson, di pirtûka xwe ya bi navê (Mezopotamya), di rûpela 127'an da dibêje ku: Dewleta Medî, ji hevdugirtina çend Eşîrê Kurda hatiye damezirandin.

Pisporên zimanê rojhilatê jî, dibêjin ku, zimanê dewleta Med, zimanê Kurdî ye an jî weke zimanê Kurdê îro bûye (Muşîr-ûd-dewle Îrana kevn, bi zaravê Farisî, rûpel.57).

Herwekî ku ji pirtûka pîroza Zerdest pêxemberê Kurda jî, wilo tete zanîn, ku em ê di nivîsînek din da bi taybetî û dirêjayî, jê dabaş (behs) bikin ola wî ya pîroz û pirtûka wî ya pîroz, Mishefa Reş û Cilweya pîroza Ezdiya û Laleş û Şêx Adî jî, binivîsin-û jê bûyer bikin.

Herwiha tete zanîn û derdikeve ronahiyê ku Îran û Kurdistan berê yek bûne, femandariya wê, di destê gelê Kurd û Pers da bûye ku her du jî, ji yek nijadekin (ji yek nişekin), ku ew jî, nişa gelê Aryanî ye; geh Kurd, geh jî Pers di femandarîtiya niştîmanê da, giran hatine, geh jî bi hevra ceng û şer kirine; belê li hember gelên biyanî bi hevra bûne, heta de-

ma peydabûna ola Îslamê û dagirkeriya Ereba, ku çî hatiye serê Kurd û Kurdistanê piştî kifşebûna ola Îslamê û cerd, pûr û talana Eraba, Moxol, Tatar, Selçoqî, Osmanî û Ecema dest pêkiriye.

Belê, her tim femandarîtiya navînî di dest Kurda da bûye, di ziman û çandên xwe yên netewî da azad bûne û bi serê xwe bûne; bi wan gelê biyanîra têkoşîn kirine. Di dema femandarîtiya dewleta Ebbasiyan da, femandarîtiyaa Mervanî (Mervanî Kürt Devleti), di navbera sala 990-1096 da, ji aliyê bazê lawê dostek û xwarziyê wî Ebû Eliyê kûrê Merwan li Hesenkêf (Heskêf) û Meyafarqînê hîmê wî hatiye avêtin û damezirandin û nêzikê 110 salan femandarîti kirine. Ku jî aliyê olî da (dînî da), bi xelîfê (canîsin) Ebbasiyan ve girêdayî bûne, sinorê dewleta wan jî Erdîşê heta tixûbê Suryayê çûye.

Hemdemê wê dewleta Mervaniya Kurdî jî, di sala 951-1088 da dewleta Şeddadiya Kurdî jî, femandar bûye ku hîmê dewleta wî jî, ji alî Muhammedê Kûrê Şeddad va, li Anî û Nexşîwanê hatiye avêtinê û sinorê wê, heta Meleyayê çûye; di pey wan ra jî, di Kurdistanê da, bi sedan femandarîti û desthilatdariyên cihên (hanlik, beylik, mirlik, prenslik) çê bûne û hukumdariya Kurdistanê (femandarîtiya Kurdistanê) di destê wan da bûye, her çiqas ku bi hevdûra bi gelên biyanî re di ceng û şeran da bûne, lê belê, hukumraniya welatê Kurdistanê di destê wan da bûye, Kurdistan bi serê xwe û azad bûye. Heta ku di sala 1514 da Yavuz Selîmê Osmanî diçe cenga Çaldiranê, ku bi alîkariya Şêx Îdrîsê Bidlîsî femandariyên Kurda diçin aliyê Osmaniya û Ecemê Sefewî mexlûb (bindest) dikin û li ser wî ku: Yavuz, belîniya (vaad) azadiya Kurdistanê di de û di wê derheqê da, fermannamekê jî dinivîse; belê, mîxabin! Belîni û ehda xwe, bicî nayne, di navbera cerd salan da, hemû femandariyên Kurdistanê dixîne

bindestê Osmaniya. Di navbera wan û Osmaniyan da û di navbera wan bi xwe bi xwe da her tim ceng, ser, kuştin, cerd û tan bûye.

Melik Ehmedê Waliyê Osmanî yê Diyarbekîrê (Amedê), dema ku hêrîş (êrîş) dide serxanê Bêdlîsê (Avdalanê kûrê Şerefhan) ku zanyar û pisporêkî pir mezin bûye, di pirtûkxana wî da nêzikê heftê (70) pirtûkê wî yên ku bi destê xwe nivîsî bûye û çar hezar (4000) pirtûkê zaniyariyê din, dişewitînin û Bêdlîsê talan û xirab dîkin, her wekî karê wan hova li hemû derê Kurdistanê din jî, wilo bûye.

Dewleta Osmaniyan bi lêp, hîle, fend û dolabên şeytanî, bi ol, mezheb, terîqet, eşîret, şêx û serokê wek Îdrîsê Bêdlîsî, selteneta xwe li ser Kurda bi Kurda dumandiye, û her timî wan bi ol û biratiya olî xapandine. Kurdistan li navbera her du dewletên kedxwar û xwînmij (Osmanî û Îraniya) tete parê kirin û dibe du parçê û dibin cewr û hovîtiya wan da dimîne; belê, dîsa jî di karê navînî da di çand û kelepûrê xweyê netewî da, bi serê xwe bûye. Heta ku piştê cenga duwemîna cihanê, dewletên zordest (Îngîlîz, Fransîz, Îtalyan, Yunan) împaratoriya Osmanî bela dîkin û di nav xwe da par dîkin û li bakurê Iraqê, di bin serokîtiya Şêx Mehmûd Berzencî da desthilatdariya (fendarîtiya) Kurda dadimezire (çêdibe) û Şêx Mehmûd bi navê Melîk-ül-Ekrad (femandarê Kurd) dibe serokê wî.

Şêx Mehmûd, li bakura Iraqê Mistefa Kemal jî ji Samsunê di 19 Gulana sala 1919'an da dest bi şoreş û cenga serxwebûnê dîkin. Mistefa Kemal di Belavoka Amasyayê da (Amasya Genelgesi), di Civat û Kongra Erzurum û Sîwasê da biratiya gelê Kurd û Tirka dixebitîne û gelê Kurd û Tirka, wekhev dinase û dibêje: Welat, niştîmanê me hemiyan e, ne ye Tirka bitenê ye ne jî ye Kurda, belkî ye Kurda û Tirkan û gelên musulmanên dinên teva ye. Dîsa dibêje ku,

piştî hemû mafê (heqê) Kurda yê netewî û çandî bidine wan, wek bira bi hev ra bibin yek, derheqa wê qasî da, namekê jî, ji Şêx Mehmûd ra dişi-ne, jêra dibêje ku li ber îngilîza serî hildin, ew ne musulman in, em musulman in, birayê hev in, piştî me welat azadkir, em ê, hemû mafên we bidine we, ji Kurdan ra heqê azadiyê binasin: Belê, sed mixabin! Piştî ku welat bi xwîna gelê Kurd û Tirk û yên din tê şuştin û azad dibî, di sala 1923'an da di Civat û Peymana Lozanê da (24 Tîrmeh -Temmuz-1923) Kurdistan, di navbera Tirk û îngilîz û Fransîzan da parçe dibe tê parkirin dikeve bin destê Tirk, Erebb, Ecema her wiha careke din jî, bi navê ol û biratiya olî, gelê Kurd têtê xapandin û ji mafê xweyê mirovayî (insani) û demokrasî û netewî bê par dimîne; belê, heq heq e, (maf maf e), îro nebe dê sibê bê standin şêr, bêngirtin jî şêr in, (dunya bidore, ne bizore).

Kurdê serê çiya ne çavtex û jîr û mên in
Merdê Med û Keya ne, dêw û piling û şêr in

Lawê key û Kiyaksar, goderz û Kew û Kawa
Şêrgo, selah û serdar, Qardoxiyê dilêr in

Kasîne Gotî, Madî, xaldîne Hûrî, Nayrî
Merwanîyû Şedadî, kalê me yê bikêr in

Îro jî, em ku xurt in, dujmîn ji me ditirsîn

Çendan, ku bêne girtin, şêr hertimî ku şêr in

Azadî, em dixwazin, mafê demokrasi

Dujmîn ku hîlebaz in, qels in, teres, ne wêrin

Ger dixwazî, min binasî, guh bidêre: kîme ez
Hind-û-Ewrâpî me, Kasî, Hûrî, Mîtanî me ez

Gotî Qardoxî me, Xaldî, Nayrî, Manayî, Medî
Koşî, Sûbarî me Qardî, şêrê Aryanî me ez

Namiq û Firdewsî kîne, Bûlele û Buhterî
Suxteyê pîrê Cizîrê, Hezretî Xanî me ez

WÊJEYA KURDÎ

Wêjeya Kurdî, îro di nav wêjeyên cihanê da xweyê cih û rewşek gelek qenc û bilind e. Mem û Zîna Xanî, Dîwana Mela, Dîwana Riza Telebanî, Hacı Qadîrê Koyî, Bêkes, Nalî, Hejar, Dildar û yên din. Dîwanên şahê wêjevana Seydayê Cêgerxwîn, bi wêjeyên cihan ra di hêrîşê dane û di sûka wêjevanî da pir bi rûmet û buha ne.

Her kes bi qasê xwe, me jî nêzikê hezar rûpelan, bi navê "Dengê Kurdistan" penc dîwan ristine û derbasê derva kirine, ku wê di nêzik da bi navê Ewîn û Şîrîn, Birîn, Girîn, Çîrok û Dîrok, bêne çapkirin û weşandin. Eger ku mirin keys û fesala me ne bire. Dê em ê hinek xelekê nuh jî, bihûnin û bi zincîra "Dengê Kurdistan" ê ve deynin û dirêj bikin.

Ah û nalîn û fîxan e, êş û çîk û janê tê
Bilbilê şeydan e, Dengê kurd û Kurdistanê tê

WÊJE LI SER DU BEŞAN E

1 - Beşa zarî (şîfahî)

2 - Beşa nivîsarî

Beşa zarî, ku jêra dibêjin wêje yên xelkê bi çêbûn û hebûna zimanê gelan ra dest pê dike û dimeşe; dengbêj, kilambêj, çîrokvan, destanbêj, pêkenînzîzan û nuktedan ên her gelî, bi awayê rewş û babeten demên ku tê da jîne, gotine û dibêjin, huner û pêşetiya xwe didomînin.

Wêjeya nivîsarî jî, ku nivîsandin çêbûye dest pê kiriye. Ev jî, bi du bir û beşan e:

- 1- Wêjeya Gelî (Halk Edebiyatı)
- 2- Wêjeya Dîwanî (Dîvan Edebiyatı)

Em dikarin bêjin ku, belgên wêjevanî ya nivîsariya Kurdî ji pirtûka Zerdest pêxember (Avesta) dest pê dike, ku ew pirtûk kaniya zimanê Kurdî ye (660 bz.).

Di pey ku Kurd bûne musulman bi hezaran wêjevan û zana û pispor û dîrokvanê Kurd, bi zaravê Erebbî, Farsî û Osmanî pirtûk û dîwan nivîsîne. Şaîrên namdar ê Osmanî Fuzûlî û Nabî, şaîrên netewiyê Erebbî Ehmed Şewqî dîrokvanên meşhûr İbn û Kesir û İbn û Xelken jî Kurd in. Ji Erebb, Ecem û Osmanîyan ra xebat kirine û bûne pîrê wan, durr û cewherên xwe yên giranbiha ji wan ra pêşkêş kirine û bê nîrx û biha mane.

Lê, Baba Tahîrê Hemedanî (935-1010) li domarê hezar salî beriya nuha, helbesteyên lîrîkî û evîndarî, sofîtî û felsefî, bi zaravê Kurdiya Lorî nivîsiye, dîwana çarikên di wî (rubaiyatê wî) di sala 1333 koçî da (hîcrî da) li Tehranê hatiye çapkirin.

Bi wî awayî jî Baba Tahîrê Kurdî, di dîroka wêjeya Kurdî da cîhekî pir girîng û bilind girtiye (canê wî yê pîroz şabe, hezaran rahmet û pîrozî lis axa wî be).

Di pey wî ra jî, Mele Perîşan bi Kurdî nivîsiye. Li du wan jî Eliyê Herîrî, Melayê Cizîrî nivîsîne. Ehmedê

Xanî dest bi wêjeya netewiya Kurdî kirîye û destana Mem û Zînê nivîsîye, ku di hunerê wêjewanî da belga (wesîqa) şanaziya gelê Kurd e xwedê heske, em ê ji vir wiha di kovara Navenda Çanda Mezopotamya ya jorîn da helbestên wêjewanên Kurd yek û yek ji were binivîsin û li ser lêkolîne bikin.

Hîvîdarin ku ji vir wiha, bi nivîsînê wihakî, xwendevanên me yên delal û hêja derbareyê wêjewan û biwêj (şair) û helbestvanê Kurd da Rewşen bivin, li suka durşinas û gewherfiroşên Kurdistanê durr û cewherên wan ên giranbuha û pir bi rûmet, bibînin û binirxînin û bikin, li meta û qîmetên xwe yên pir buha xwedî werin.

Çawan ku pîrê wêjewan Ehmêdê XANÎ dibêje:

*Ger dê hebûya mejî, xwedanek
Sahib keremek, we nuktedanek*

*Neqdê me di bû bi sikke meskûk
Nedma, wehe, bêrewac û meşkûk*

Yanê: eger ku xwedî, xwedanek mejî hebûya da pereyê mejî sikke bi-biya û bi rûmet û rewac bûya, bi şek û şubhe nedima.

*Dê roj were em jî bibne dîldar
Dûrrê mejî lê, werin xirîdar*

*Bazara dunê bi qedr û qîmet
Lê em jî werin bi nîrx û rûmet*

*Rewşen ku hebin li herdiyarî
Rojê me derê nemîne tarî*

*Bextê me ji xew ku îdî rabe
Rextê xwe hilîne dil ku şabe*

*Em jî, ku bi dest xwe xîr wî Qasî
Her mafê xwe ên Demoqrasî*

Binivîsinin li ser welat

*Pîroz be ev xebat û tevdir
Herhebe saziya rewşenbîr
Pêşketine bi bawerî û bîr
Ji bo welêt pêkhati*

*Hezar sale em dilbîrin
Em guhdarbûn rojek mizgîn
Tev beşdarbûn roja şêrin
Pênûs bo me bi xebitî*

*Mêjî girt zeng û gemar
Xwe berdabû çav û damar
Navê wêye xewa dişwar
Gelek salan tev raketî*

*Carek bi xwe nebû bawer
Ronakbîran xwe nedan ber
Agir berdan dil û ceger
Bi şev û rojan dişewitî*

*Dijmin dîkin fen û deka
Xweş zanabî tujî keka
Qelem ketî şûna çeka
Ê ku xwendî bi pêşketî*

*Yekîtî, biratî pir xweş e
Wek cejna pîroz û geş e
Ji bo serxwebûn û azadî
Wek fînd û çira wêketî*

*Dibore dema kar û xebat
Bi xwîna şehîdan roj hilat
Binivîsinin li ser welat
Her tişt wekî rojê derketî*

*Gel birçî, jar û mest
Tev tîrs û talan û west
Welat hê nîne serbest
Bimre kedxwarî û kevnepereştî*

Herbijî

Welat Nadim

*Welatê min buhayê ew
Bi misk û enberê nadim
Wekî dayka min û bave
Bi zêr û cewheran nadim
Dema cejnê û şehyanê
Bi keçkên nazînî nadim
Çi zore ev... çi talan e?
Piyala kewserê nadim*

*Bi ava kewser û zemzem
Welat hersal ditê şuştin
Xwîna lawik û keçkan
Ji boyî gel ditên kuştin
Ji dildarî û xembarî
Bi rext û xencer û piştin
Ji boyî Kurd û Kurdistan
Hemî dinya li şun hêştin...*

*Welatê min bilindî tu
Wekî Agrî ji zozana
Bi eşqa xwe tu namdarî
Wekî Xanî bi destana
Gelek mîrxas û dişêra
Ji Kurmanca û Sorana
Ji boyî te dibin gorî
Li qadên şer, li zîndana...*

*Neyar hatin bi pîlanan
Bi zêr û mal û davên xwe
Hema Kurdên welatê min
Welat nadin bi sedrengî
Bi rovtî û cilkên nuh
Hema keçkên welatê min
Welat nadin bi zavên xwe
Neyar hatin me berdîn hev
Kur û bavan li dij hevdu
Hema lawên welatê min
Welat nadin bi bavên xwe...*

Cankurd

KURMANCIYA BAKUR... KURMANCIYA BAKUR... KURMAN

DERSIM SER ÇEND QESEY

Kurdistanî de, dîrokê jiyana qomî zaf zaf kan o. Karê kinitena arkeologano ke kela Wan û dorme de amo kerdene, resmê riyê kemeranê ke zaf cawonê Kurdistanî de ame peydakerdene, karê arkeolojîkê ke hurendiya Barajê Kebani û dorme wuzay de amê kerdene, kenê eskera ke dîrokê qomê mordemiya Kurdistanî sono reseno ses hezar seran V.Z. (Verê Zayênî). Mordem ke resmanê riyê kemer û esketan ceno ra çimî ver, vîne no ke panzde (poncas) hezar seran raver koyanê Kurdistanî de mordemî biyê. Wonca, na resmê kanî musnenê ma ke, panzde hezar seran ravêr qomanê na hardî wextê klaniye û suriyenî de viyê. Sayd kerdo, çiye werdene kerdo are, esket û lonanê kemeran de xo sîtar kerdo. Na qom, key amo naza, kotî ra amo ta? Weradi-me her wext naza mendo, yan biriyo ra şîyo? Eskera yo ke, kes cavê na persî bese nê keno ke tamam bido. Heqîqate aya ke, dîrokê sarê Kurdistanî xeyle kan o; nara, qomê Kurdistanî wayire kulturode kanî û dîrokê de dergî yo. Jiyane qomê mordemiye, wexte verenî de, her het ra taviyat ra gîredaye vî. Cayê ke tey awe esta, mal û tayr-tûr esto, weşîye-werdene esta, esket û sîtare peyda bena, wuzayî serva jiyane qomî rind viye; na het ra hardê Kurdistanî xeyle misayit vî. Wonca arkeologan veto wer-te ke, dewe viraşten û miqerem biyayene kî Kurdistanî de her cayê dîna ra rewer biyo. Erxaniye de ju paga dewera kane vejîye wer-te ke, naye ra new hezar seran ravêr ama viraşte-ne. Zanay na dewe jê dewa dînya kantire hasav kenê. Na karê zanayî îspat kenê ke, dîrokê qom û sîvilîzasyonê Kurdistanî zaf rewer dest keno pro.

Kurdistan, dîrokê qomanê Asya

de jê pirdî viyo: Qomanê ke Îranî ra, Qafqas ra amê, na pirdî ser ra vêrdê ra. Çi eve haştîye, çi eve şer vo, çi naza miqerem vê çi biwoncê şêrê, na qoman xo pey de reçî caverdê. Ayê ke reçê niyanenî verdê, yine wextê xo de tesîrode xori îcra kerdo. Ni re-çanê niyanenî, peydabiyayên û verşayena jiyana qomî de biyê wayirê bare. Çi rind çi xirav, rengê tore û adetanê xo do qomanê verenî, reyna rengê qomê verenî gureto. Çi esto ke, taye qewetin biyê, hen rew nê vîleşîye ro, wer-te ra vînd nê viyê; ya zanê yine ra, ya adet û ananê yine ra taye xet û reçî mendê. Hama na wextanê derg û têwer-te de roze ve roze qomanê ke na hardî sero piya weşîye, her het ra jubîn ra biyê nejdî; endî na hard biyo welatê têdine. Wextê ma de kî qomê "Kirmanî" jê mîletî, "Hermenî", "Asurî", "Suryanî", "Erebî" û taye bînî jê "senikmîletî" hurendiya xo de mendê. Wonca, taye cawonê Kurdistanî de Tirkanî kî beno ke jê, "senikmîletî" bêrê hasav kerdene. Nara, mordem ke dîrokê Kirmaniye de niyadano, besekeno vazo ke, kulturê Kurdistanî her het ra dewlemend û rengîn o; mîletê Kirmanî kî wayirê na mîrasiyo. Eskera yo ke, na vatena ma nê yena a mana ke, mîletê Kirmanî -çitor ke dewleta Tirkanî kerd- renganê kulturê sarê Kurdistanî û qomanê verenî înkâr bike-ro, yine têdine mîletê Kirmanî ser hasav bike-ro, huskahusk vazo ke "her çi yê min o, ravêr û tepiya xora ez vî-ne". Rastiye aya ke, dîrokê qomanî kan o, hama yê mîletan honde kan nê yo; na sevete ra kes bese nê keno ke qomanê verenî jê mîletî hasav bike-ro, her çiyê yine kî jê yê mîletê xo name kero. Ma gere eve çimanê xo ra û usulê zanyarî ra probleman bivî-nîme, bar û rolê her çi xo vîra nê ke-

rîme. Welatê Kurdistanî de ya kî welatanê bînan de, çi "mîlet" çi "senikmîlet" bê, hunerê têdine gere eve re-hetiye bêro namekerdene.

Na sevete ra, îtîqat û toreya Kurdistanî kî reng ve rengê; hen ke, mordem nê şîkîno ke sevata têdine ju qeyde wez kero, yan vazo ke her he-tê na welatî de xora eve ju-reng anane û tore estê. Na qese, seveta folklorê Dersimî kî rast o. Je qomanê kanî, taye adetanê sarê nazay kî hona hurendiya xo de mendê; qomê ke têdima ame na mintîqa, jubîn ra tesîr kerdo; jê "Hatî, Mîttanî, Hurî, Nayirî, Urartu, Îskit, Medya, Pers, Hellen, Rom, Bîzans, Îslam" û devletanê bînan, xeyle çi amo ser de. Eskera yo ke, taviyat û coğrafyayê na mintîqa kî sarî re tesîr kerdo. Hama zana-yox û niviskaran ra gore, Dersim de taye adet û îtîqatê kanî hona kunê ra çimî ver. "Nurî Dersimî" vano ke: *"Xiristiyanîye kî tayvet Dersim de bese nê kerdo nîfus bikero; hata mintîqayê ke tede nîfus kerdo kî dînê Arî yê kanî rengê xo do aye, ama ra vurenayene"*. Rast o, dînê xiristiyanîye Dersim de bînge nê gureto; hama naza jê Hermenîyan saro xiristiyan kî biyo, her tesîr ve jubîn ser kerdo. Hona kî taye adet û îtîqatê wertaxî kunê ra çimî ver. Wonca, tesîrê dînê Îslamiye kî naza jede xori nê şîye; nafa îtîqatê xoye verenî, kulturê Arî, bine perda Îslamiye de dom kerdo.

Wexto ke dînê Îslamiye vejîya wer-te, qomanê Îran û Kirmanî wayirê kulturode kantir û dewlemenderî vî. Yî rozan ra ve nata dînê "Zerdeş-tî" wer-te qomanê Îranî de bînge gure-tivî; qomanê nazay wayirê medeniyet û kulturode rengîn vî. Nara, kes nê wast ke hen eve hasaniye ra dînê Îslamî qevul kerê. Eve sero Îslamiye re serê xo nê naro, leşkerê Erevan eve sero seveta Îslamî şer kerd. Hama

xo leşkerê Erevan ver de racero, teslîm viyo; roze ve roze qomanê Îranî kotî bine bandira Erevan û dînê Îslamiye. Eve vatenade bîne, endî mezvur mendî ke sarê xo na dîna neweye ver de ronê. Qomî adet û îtîqatê xo ye kanî, kulturê pî-kalkanê xo ca nê verda; hama yi eve famê Îslamiye reyna gureti ve dest, nafa bine perda Îslamiye de wonca day dom kerdene. Se ke taye zaniyoxî vanê, dînê "Cuyidiye (Yahudiyenî)" mesela, îtîqatê "fîkrê melekan û adirê cenemî de vêsayena kesê xiravkarî", dînê Zerdestî ra gureto, ya kî bine tesîre ey de resto na fikro niyanenî. Xora dînê Îslamiye û Xiristiyanîye xeyle çiyê xo dendarê Cuyidiyenî yo. Raste aya ke, dînê Zerdestî na dînanê peyenî ra zaf zaf kan o; yine xeyle fikr û îtîqatê xo dînê Zerdestî ra gurete. Qomanê ke îtîqatê xo eve dînê Zerdestî ardvi, eve na kultur terviya bivî, qevulkerdena Îslamî yine re hasan nê vî. Heta Erevan kî adet û tore xo ye verenî bine ra ca nê verday, nafa binê perda Îslamî de day dom kerdene. Taye cayonê Kurdistanî de dînê Îslamiye rew binge guret, hama Kirmananê Xoresan û Dersîm xeyle eşt xo ver. Xora Kirmananê Ezdî kî dînê Îslamiye qe qevul nê kerd, aqîda Zerdestîye eve senik-vurenayene dê dom kerdene. Wonca, dînê Îslamî werte Tirkmanan de kî jede rî nê dî.

Werte Îslamî de ke niza xîlafetiye vejiye, sarê Îranî û taye Kirmanan hetê "Hz. Elî" guret. Eve na hal, bî Elevî. Kirmananê Dersîm û "Ehlî Heq" hetê îtîqat ra jede jubîn ra nejdî yê. "Eba Müslimê Xoresanî" ke eve destê xelîfê Abasiye ra ame kiştene, nafa Kirmananê Elevî bê serok mendî, xeyle zamet û zulum dî. Tayine Xoresan ra bar kerd amey Dersîm û mintiqanê bînan. Dersîm, eve ca û coxrafayê xo serva Kirmananê Elevî parezgayode rind, meterisode qayim vî. Sarê teverî çixa ke qol eşto sarê nazay ser çî hete siyasî, çî hete kulturî ra- nê şikiye ke naza giraniyade girse peydakerê. "Haci Bektaş Velî" ke ame Anatoliya, xelîfê xo ye ke

binera Kirmanî vî, yi rusnay Dersîm ke qomî îrşad kerê. Hama se ke Nuri Dersîmî vano:

"Heqîqete aya ke Dersîm de, eleviyênî eve rî qebeyênî menda. Rasto, Hz. Mihemedî re hurmet kenê; Elî jê camerdode çer û comerd cenê ra çimî ver, xeyle hurmet û movet ci re kenê; hama na hez û îtîqat pê ardene manayadea tayvetî ra jede avêr nê sona..."

Kirmananê Dersîm kî bê sik misilman ê; hem kî xo sarê bîni ra jede misilman qevul kenê. Hama adet û îtîqatê xo wexto veren de ke çitor viyê, hen mendê.

Folklorê miletan de hem xisletê millî estê, hem kî xisletê enternasyonalî estê. Mordem huner û ruhiyatê cematê xo, sayiya folqlorê xo de naskeno. Se ke sero ke ma vatîvî, anane û torey -ke hetera folklorê- hem rengê cematê tayvetî, hem kî rengê qomanê bînan danê. Çi ke dîrokê mordemiye de qonaxê verşayene rengê jubîn danê. Vajîme ke qonaxê feodaliye de mesele û mitayiyê camatî jede-senîk jê jubîn ê; nara, binaxê kulturê na demî jede ferq nê keno. Na sevete ra berhemê kultury, tede qoman de rengê jubîn dano. Hama her qom kî wayirê taye xisletanê teybetî yo. Na rastiye kulturê camatanê ju qonaxî de kî xo kena eskera. Mesela folklorê tede miletan de "reqs" esto. Camat eve yine zereweşiyê û şayyanê xo, kar û kerdena xo, îtîqat û resm-rusmê xo, hata her hetê jiyana xo ano ra zan. Hama her ju xo ser û hunermendiya xo ser reqsan peydakeno. Wonca, dîna û royê her camatî, her ca de jê jubîn nê vejînê werte. Taye dansî este ke bahsê yine mîsterek o, hama ta û figurê yine xeyle ferq kenê. Na hal seveta kulturê mordemiye alametê dewlemendiya zevq û hunerê mordemî yo.

Folklor, terviya biyayena îsanî de, gur-geş kerdena hîsiyatê netewî de wayirê cayode tayvetî yo. Mordem tam û qîmetê folklorê miletanê bînan kî sayiya folklorê xo de naskeno.

Nara, gere jê tede miletanê dîna Kirmanan kî folklorê xo komkerê; bine roştîya zanîn de tetqîq kerê. Seveta na karî kî beno ke herkes xo biqefelno, jede cad kero. Hen ke qismê folklorê Kirmaniye juveju vejîyê werte.

KILAME SERVA AZADÎ

*Brayenê!
Destê Botanî ra
hevalan vengdanê
serva azadî, serva azadî!
vengdanê naver:*

*-Bêrê ve tever
erê wayenê
vala xo tadê
navera niyadê:
Kile xildana
berxwedan a
serva azadî, serva azadî!
Adir biyo zerd
yiye Zerdest o
asmen biyo kesk
jê perojî roş to!*

*Brayenê!
Destê Botanî ra
hevalan vengdanê
serva azadî, serva azadî!
-Adir wekerê
ad're Zerdest o
nayo ke vêseno
hîrîs û heşt o!
Bêrê ra xo ser
xevera xeleşî
birusnê naver!*

*Koyê ma berz ê
roştî rê têsanê
ala rawurzê
herman pêsanê
serva azadî, serva azadî!*

